

## Jin avaniya civakê ye...

Her gulek bi bêhn û rengê xwe heye. Hemû gul jî bi awayê xwe xweş in. Dema dibin kom, bi heybetir û rengîntir dibin. Ev heybera ku kêm tê hesibandin, bi rastî dikare zehmetiyên dinyayê hilgire ser milê xwe, lê di heman... *Guhara Hesen/R.2*



## Li hundir û derve tifaq

Peyva tifaq dikare wek piştgirî, hevalbendî, hevgirtin, yekbûn, yekgirtin were pênasekirin, ku di van rojan de pêwîstiya kurdan ji ya hemû kesan zêdetir pê heye. Li rojavayê Kurdistanê pêşketinên wiha girîng û hêvîdar çêdibin... *Hesen Huseyîn Denîz /R.7*



## Dewlet û şaristanî

Di roja me de ne tenê hêzên mezin, dewlet-şaristanî jî (di qonaxên pêşketina xwe yên cuda de) jî bi xwezaya xwe û rola xwe ya yekta di pergala têkiliyên navneteweyî de haydar in. Divê ev faktora girîng hem di dema... *Kurdistan Lezgiyeva /R.6*


27 Çile - 3 Sibat 2025
Hejmar: 267
Buha: 20 TL
rojname@xwebun.org

# xwebûn

xwenasîn e




## Gel ji bo av û axa xwe bûye mertal

Hevseroka Desteya Rêveber a Ekolojiyê Almaz Romî anî ziman ku çirûska Şoreşa 19ê Tîrmehe li Kobanê pêket û belav bû û got: "DAIŞ li Kobanê têk çû. Dewleta Tirk ji bo tola xwe hilîne dixwaze dîsa Kobanê dorpêç bike û dagir bike. Gel ji bo ax û ava xwe, bûye mertal. 10 sal in Kobanê bi sembola berxwedana li dijî DAIŞê tê zanîn û nasîn. DAIŞê di 2014an de li Iraq û Sûriyeyê dest bi êrîşan kir. Êrîşên DAIŞê yên di 14-15ê îlona 2014an de li hemberî Kobanê hatin destpêkirin, 134 rojan dewam kirin. DAIŞ li vir rastî berxwedaneke mezin hat û tailiyê têk çû. Bi hezaran ciwanên kurd û enternasyonalîst beşdarî pêngava rizgarkirina Kobanê bûn. Berxwedana dîrokî di 26ê çileya 2015an de bi serketinê bi dawî bû. Kobanê di wê rojê de bi temamî hat rizgarkirin. Le êrîşên Tirkiyeyê li vir bi dawî nebûne... *Hevpeyvîna Mehmet Alî Ertaş /R.4*

## Alerjiya li dijî demokrasiyê

Heyeta Îmraliyê hevdîtina xwe ya duyemîn bi Rêber Apo re pêk anî. Hevdîtin 22'yê çileyê pêk hat. Parlamanterên DEM Partî pervîn Buldan û Sirri Sureyya Onder çûbûn giravê. Hat ragihandin ku endamê heyetê Ahmet Turk, ji ber rewşa wî ya tenduristiyê ne başbû di hevdîtinê de cihê xwe ne girtiye. Detayên derbarê şande û hevdîtina bi Rêber Apo re, ne tenê gelê Kurd û aliyên demokratîk hemû derdorên cûda ji nêz ve eleqedar dike. Lewma bala herkesî li ser peyamên Rêber Apo ye. Gelê Kurd û gelên herêmê di serdemeke dîrokî de ne. Bi taybetî jî her agahî. Her peyama ji Rêber Apo tê, hêviya mezinkirina"... *Felemez Ulug /R.6*

# MÎMARÊ ÇARESERIYÊ AMADE YE

# Lê dewlet?

Rêberê PKKê Abdullah Ocalan her tim ji bo çareseriya demokratîk gav avêt. Gelek caran agirbesta yek alî îlan kir. 26 salin li Girtîgeha Îmraliyê di yek hucreyê de tê girtin. Tevî ku 26 salin di tecrîda girankirî de ye jî her tim peyamên çareseriya demokratîk û aştiyane par ve dike. Tevî hemû polîtîkayên dewletê dîsa di çareseriya demokratîk û aştiyê de israr dike û niha jî li ser heman fikre ye. Di salên 2013-2015an de bi rêya şandeyê, dîsa di navbera gulana 2019an û tebaxa 2020an de bi rêya parêzer, malbat û niha dîsa bi rêya şandeyê peyamên ji bo çareseriya demokratîk par ve kir. Her tim nexşeya çareseriyê pêşkêşî gelê kurd, Tirkiyeyê û Rojhilata Navîn kir. Çareserî pêşkêş dike. Her tim tekoşîna jiyan û jiyandinê esas digire. Dibêje 'Li gorî nîşana dîrokê tirk beyî kurdan û kurd jî bêyî tirkan nikarin bijîn. Hebûn û pêşketina Kurdan û hebûna Tirkan bi hev ve girêdayi ye. Ev yekîtiya kurd û tirkan, dê rê li pêş jiyana demokratîk û aştiyê ya gelên li Rojhilata Navîn jî veke....*R.3*



## 26 sal - 26 bajar - 26 kes - 26 roj

Wek ku tê zanîn 'Meşên Dirêj' li Ewropayê êdî bûne wek kevneşopiyekê ku hema bibêje her sal li welatekî Ewropayê pêk tên û bi taybetî li bajarê Strasbourg ê jî bi dawî dibin. Îsal jî dîsa Meşên Dirêj dê pêk werin. Di vê nivîsê de dixwazim bahsa 2 meşên dirêj ên girîng bikim û herwiha armancên wan bi were parve bikim. Ev meşên dirêj her sal bi armancên cur bi cur tên organîzekirin. Meşa yekemîn a îsal ku li bin navê '26 bajar, 26 kes û 26 roj' li Fransa bajarê Lorient/Lannesterê di dîroka 21ê rêbendanê de dest pê kir. Meşa dirêj dê di 15ê sibatê de li bajarê Fransayê Strasbourgê bi dawî bibe... *Siyamed Sîpan / R.7*

## Şewata Vartînîsê bû belgefîlm!

Çend meh berê belgefîlmek derheqê şewata sala 1993an a bi mirina 9 kesî hatibû pêkanîn bi navê 'Vartînîs' hat çêkirin û nîşandan. Di belgefîlmê de şahîdê bûyeran û hiqûqnas behsa şewata mala M. Nasir Ogut, helwesta artêşa tirk a li dijî kurdan û nêzîkbûna rayadarên dewletê tê kirin. Vartînîs gundêkî girêdayî Têlî ya bajarê Muşê ye. Gund, di 3yê cotmeha sala 1993yan ji aliyê artêşa tirk ve hat şewitandin. Di encama vê şewatê de ji heman malbatê 9 kesan jiyana xwe ji dest dan. Li ser vê şewata Vartînîsê 32 sal derbas bû. Heya niha di vê mijarê de gelek nûçe, bername û rapor hatin amadekirin. Lê cara yekemîn belgefîlmek bi vî awayî hat çêkirin. Derhêneriya belgefîlma Vartînîsê jî ji aliyê Omer Bîçer ve hatiye kirin. Belgefîlm bi giştî 56 deqîqe ne... *Alî Guler /R.11*

## Dewletê ke xo sucdar hîs kenê

Cergê "hakanî" Bakûrê Kurdîstanî de zî polîtîkaya tedakere anê ca. Kedkarê çapemenîya azade her hewte raştê zulm û zextan yenê. Tewr peyên rojnamegerî Reyhan Hacioglu, Necla Demîr, Rahîme Karvar, Ahmet Guneş, Vedat Oruç û Welat Ekîn tepişîyayî. Sey her wext înan rê sucê "endambîyayîşê rêxistina terorî" erzîya. Teror, terorîstan, terorîzm ra ber tu çekuye nêzanê. Rojnamegerî seba ke raştîye nusenê, raştê her tewr cîyakerî yenê. Hakan û aygucî hem vanê ke aştîya komelkî bêro awankerdene, hem zî binê prosesê aştîye rê dînamît erzenê. Tepiştişê rojnamegeran astengîya aştîya komelkî ya. Dewletê ke xo sucdar hîs kenê, kenê ke rojnamegeran bigêrê binê bandora xo. Estbîyayîşê her kedkarê çapemenîya azade yeno manaya roşnkerdişê tarîyan.Tarîya ke hakan û aygucî awan kenê de her xirabîye est a... *R.9*



## Nîlûperên ROJÊ

Li hemû cihanê piştî gulê kulîlka ku herî zêde balê dikişîne kulîlka lotosê anku nîlûper e. Nîlûper di nav ava şêlû anku qirêj de şîn dibe. Lê tu carî nahêle ku pelên xwe qirêj bibin. Herku baran dibare bi peşkên baranê rûyê pelên xwe paqij dike. Ji ber ku kulîlka nilûperê xwe... *Serdil Akdag / R.2*

## Lavrov çi dibêje

Di 13ê çileyê de Wezîrê Karên Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov li ser ekranên TVyan nirxandinên sala borî kir. Di van nirxandinan de gelek mijarên ku di nav salê de qewimîbûn bi lêv kir, li gor xwe şîrovê kir. Di van nirxandinên Lavrov de ya bala raya kurdan kişand mijara 'Iraq û Tirkiye destûr nadin avakirina Dewleta Kurdan' bû. Baş e, di vê pêvajoyê de tu aliyên siyasî yên kurd jî behsa avakirina dewletekî kurdan nekiriye... *Aramê Elegezê /R.8*


## Şehîdên me rûmeta me ne

Şehîd nirxên şoreşê yên herî giranbiha û pîroz in, derbarê vê yekê de nirxandineke wiha ya binirx a Rêber Apo heye: "Şehîd pêşengên şoreşê ne, nirxên me yên herî pîroz û giranbiha ne. Partiya me partiya şehîdan e." Bi berhema keda şehîdan têkoşîna Tevgera Azadiya Kurdistanê bi pêş ket û gihişte roja îro. Ji şehîdê yekem heval û sosyalîstê mezin Hakî Karer heta qehremanê ciwan Rojger Hêlîn û şêrejina kurd Asya Alî çelengên giranbiha yên ji bo welat û azadiyê canê xwe bexşandin û ketin rêza pêşengên pîroz. Şehîdên canfeda di serî de li ser şopa pêşeng ên weke Kemal Pîr, Mehmed Xeyrî Durmûş, Sara Dêrsim û...*Asya Veşûkanî /R.2*

Divê mirov zanibe bê kengî û li ku derê canê xwe feda bike. Fedayîtî tiştekî pîroz e, lê pêwîst e bi zanebûn be. Rêber Apo vê mijarê wiha dinirxîne: “Hewce ye ku şoreşger canê xwe hêdî hêdî weke mûman ji bo gelê xwe bihelînin û rêya wan ronî bikin.”

Asya Weşûkanî

# Şehîdên me rûmeta me ya mirovahî û neteweyî ne



Şehîd nirxên şoreşê yên herî giranbiha û pîroz in, derbarê vê yekê de nirxandineke wiha ya binirx a Rêber Apo heye: “Şehîd pêşengên şoreşê ne, nirxên me yên herî pîroz û giranbiha ne. Partiya me partiya şehîdan e.”

Bi berhema keda şehîdan têkoşîna Tevgera Azadiya Kurdistanê bi pêş ket û gihişte roja îro. Ji şehîdê yekem heval û sosyalîstê mezin Hakî Karer heta qehremanê ciwan Rojger Hêlîn û şêrejina kurd Asya Alî çelengên giranbiha yên ji bo welat û azadiyê canê xwe bexşandin û ketin rêza pêşengên pîroz. Şehîdên canfeda di serî de li ser şopa pêşeng ên weke Kemal Pîr, Mehmed Xeyrî Durmûş, Sara Dêrsim û li ser şopa bi hezaran qehremanên mîna wan meşiyan û bûn sozdarên wan. Qehreman û canfedayên gelê kurd soza xwe pêk anîn û ber bi serkeftinê ve meşiyan. Weke em tev jî dizanin felsefeya Rêber Apo ew e ku bi her şehadetekê re gaveke mezin ber bi serkeftinê ve hatiye avêtin.

Her kes dizane ku di çand û felsefeya Rêber Apo de watedayîneke pir cuda ji şehîdan re hatiye dayîn. Rêbertî her hewl daye ku piştî şehadeta her hevalekê/î biryar daye ku pêngaveke xurtir ber bi serketinê ve biavêje û tola wan qehremanan rake. Ji xwendina ezmûnên Tevgera Azadiyê her kes fêr bû ku soza ji pakrewanan re ew e ku li ser şopa wan têkoşîn bê xurtkirin û tola wan bê rakirin. Dema ku hevalê Hakî Karer bi destê çeteyên Stêrka Sor hat şehîdkirin, Rêber Apo biryar da ku Partiya Karkerên Kurdistanê ava bike. Ew biryar ket meriyetê, tola hevalê Hakî wiha hat rakirin û partî hat avakirin. Rêbertî pir girêdayî bîranîn û soza şehîdan e. Li hemû cîhanê nêzîkatiya ji şehîdan re pir cuda ye, lê di nav Tevgera Azadiyê de hîn cudatir e û xwedî wateyeke pir kûr e.

Em şagirtên Rêber Apo li ser wê çandê dimeşin. Me soz daye şehîdên xwe. Em li ser şopa wan lehengan têdikoşin û tola wan radikin. Girêdana me ya bi şehîdan re jî teqez ew e em mebest û armancên wan ên pîroz pêk bînin û li keda wan xwedî derkevin. Girêdana me ya bi şehîdan re bi awayê ku em bibin şopdarên wan û tola wan ji dijmin û xayînan rakin tê zanîn. Helbet şopdariya şehîdan ew e ku mirov têkoşîna wan berdewam bike; sekn, rêxistinbûn û hevaltiya wan ji xwe re bike mînak û kesayeta xwe li gor wê ava bike.

Şehîdên şoreşê li ser şopa Rêber Apo têkoşîneke bêhempa meşandin. Her tim sozdarên Rêbertî gel û welat bûn. Şehîdên qehreman heta henaseya xwe ya dawiyê li ser xeta Rêber Apo meşiyan, bi ked, têkoşîn û berxwedaneke binirx, îradeyeke pir mezin nişan dan. Şehîd ew in ên ku xwîna xwe ji bo mebest û armanca welatekî azad û jiyaneke b rûmet feda kirine, heta henaseya xwe ya dawiyê li ber xwe dane.

Şehîdên şoreşê bi wêrekî û qehremanî têkoşiyan, bi bîr û bawerî berê xwe dan mirinê û mirin veguherandin jiyaneke bêdawî. Şehîdên rûmeta gelan ji bo pêşeroja gelê xwe canê xwe feda kirin, meydan li dijmin xwendin. Dema ku çûn jî li paş xwe nezivirin, bi hemû hêza xwe şer kirin û gihiştin karwanên pakrewanên pîroz.

Şehîd ronahiya rêya şoreşê ne, pêşengên doza gelên azadîxwaz in. Civak bi wan serbilind e û her sonda wan a bi navê şehîdan pîroz e. Şehîd rûmeta gelan e û taca serê wan in. Wan şêrejin û mêrxasan xwe bi rext û fîşengan pêçandin, berê xwe dan mirinê û bi rûkenî gotin: “Berxwedan jiyan e.”

Şehîd ji gelan re mûm û find in, rêya civakan ronî dikin, wan dibin serketinê. Rêber Apo dibêje ku “Her dema ku hevalek şehîd dikeve, weke parçeyek ji canê min diçe. Divê hûn zanibin canê we jî ne milkê we ye. Canê we milkê şoreşê û gel e. Pêwîst e hûn demdirêj bijîn û tola gelê xwe ya bi salan ji dijmin rakin.”

Divê mirov zanibe bê kengî û li ku derê canê xwe feda bike. Fedayîtî tiştekî pîroz e, lê pêwîst e bi zanebûn be. Rêber Apo vê mijarê wiha dinirxîne: “Hewce ye ku şoreşger canê xwe hêdî hêdî weke mûman ji bo gelê xwe bihelînin û rêya wan ronî bikin.” Em jî weke hêzên YPJ ê û HSDê her roj şehîdan li ser xaka Rojava didin û em bi wan serbilind in. Ji ber ku dijminê me yê faşîst û xwînxwar warê şoreşê ji xwe re kiriye hedef û êrîş dike wisa lê hatiye ku em bi rojan e şehîdan didin.

Em di nav cengeke giran de ne û em azadiyê dixwazin. Ji ber wê bê şehîd nabe, lê divê şehadeta me jî di cih û dema xwe de be. Em li ser şopa wan şehîdên qehreman soza xwe nû dikin û dibêjin, heta serkeftinê em têkoşînê bidomînin. Em dubare dibêjin, “Me bi şehîdan dest pê kir, em ê bi şehîdan bi ser kevin.” A din jî pêwîst e em xwe bi rastiya şehîdan re bi helînin û bikin yek.

Şehîd fermandarên me yên manewî ne û di bin raya wan de, em ber bi heqîqetê ve dimeşin. Bi şehadeta her hevalekê/î em wan winda dikin birîneke nû di dilê me de vedibe û me diêşîne. Herwiha bi her şehadetekê re jî bawerî û vîna me bi hêztir dibe. Tevgera me tevgera şehîdan e û girêdana me ya bi şehîdan re dibe sedema hê mezinkirina berxwedan û têkoşînê.



Serdil Akdag

# Nîlûperên Rojhilata Navîn

Li hemû cihanê piştî gulê kulîlka ku herî zêde balê dikişîne kulîlka lotosê anku nîlûper e. Nîlûper di nav ava şêlû anku qirêj de şîn dibe. Lê tu carî nahêle ku pelên xwe qirêj bibin. Herku baran dibare bi peşkên baranê rûyê pelên xwe paqij dike.

Ji ber ku kulîlka nîlûperê xwe di nav qirêjê de paqij dihêle wateya rûhê paqij lê hatiye barkirin. Herwiha di baweriyên mîtraîzm, hindûîzm û bûdîzmê de jî temsiliyeta xwebûnê îfade dike. Li Misirê tê wateya jidayikbûna jinûve. Li gor hinek baweriyan xwedî wateyeke pîroz e.

5 rengên kulîlka nîlûperê yên wek şîn, sor, pembe, spî û mor hene.

Di baweriya mîtra û hemû baweriyên kurdan ên ku li dû mîtrayîtiyê hatine de jî kulîlka nîlûper wek sembol hatiye bikaranîn. Jinsalarî yan jî dayiksalarî ya mêhrî-mîtrayî bi gula nîlûperê tê pênasekirin û pelên wê û rengê wê weke hêmaya jinan hatiye dîtin.

Li welatê Misirê jî kulîlka nîlûperê tê dîtin û di demên kevn de rêz li nîlûperê girtine û li der û dîwarên kolandî yên nîgarkirî de di destê şah û keyan de tê dîtin. Gelek efsane û çîrok li ser vê mijarê hene. Ya herî berbelav ji van li Misira Kevnar pêk tê. Li gor gotinan, nîlûpera şîn yekitiya Misira jêr û jor pênase dike.



Li gor efsaneyan, Misra Kevn di destpêkê de li nav tariyê bû û li Nîlê aloziyeke mezin hebû. Vê aloziyê heta ku kulîlka nîlûperê şîn bû berdewam kir. Heta wê gavê her tişt tarî bû, bi hatina meha biharê re bi bandora şînbûna nîlûperê her der ronî bû. Piştî şînbûna nîlûperê ya bi tavê re êdî jiyan xweştir û geştir bû. Ji ber vê yekê jî kûlîlka nîlûperê wek kulîlka Xwedayê Tavê hat pênasekirin.

Di nav gihayan de kûlîkeke bi vî rengê heye. Gelo di nav jiyanê de yên ku tevî hemû pîsiyan xwe diparêzin û jiyanê ronî dikin kî ne? Bêguman ev jin bi xwe ne. Mînaka vê yekê ya ku hemû jiyan li ber çavên xwe dît û ji gotegotan wêdetir rastiya jiyanê ye têkoşîna ku jinên kurd di Şoreşa Rojava de dan e.

Wek tê zanîn çeteyên DAIŞê di 2014an de êrîşên xwe yên heyî yên li ser gelan li taybetî jî li ser jin û civaka êzidî zêde kirin. Netewdewletên ku ji bo berjewendiyên xwe êrîşên hovane temaşe dikirin, têkoşîna ku di pêşengiya jinan de dihat dayîn ji nedîtî ve dihatin.


Lê jinên ku li Rojhilata Navîn tune dihatin hesibandin û tu mafên wan tunebûn wek kûlîlkên nîlûperê hem nehiştin ku ew qirêj bibin hem jî derdora xwe ronî kirin. Bi vê têkoşîna ku wan dayî di 26ê çileya 2015an de çeteyên DAIŞê li Kobanê hatin têkbirin. Têkoşîna ku bi pêşengiya jinan jî aliyê gel ve hatiye dayîn piştre ji gelek jinan re bû çavkaniya berxwedanê û li hemû cihanê bû mînaka berxwedêriyê.

Piştî vê serketinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jiyaneke li ser rêzgirtina cudahiyên neteweyan hat avakirin. Mixabin ev destketî hê jî ji aliyê dijminên ronahiyê ve hedef tên girtin. Lê nîlûperên vê erdnîgariyê bi hêza xwe tu carî destûr nadin ku tarîtî li ser wan serwer bibe. Ew nîlûper bi hêza ku ji ROJa xwe digirin li Rojilata Navîn dibin pêşengên serdemeke nû.



Guhara Hesen

# Jin avaniya civakê ye



Her gulek bi bêhn û rengê xwe heye. Hemû gul jî bi awayê xwe xweş in. Dema dibin kom, bi heybetir û rengîntir dibin.

Ev heybera ku kêm tê hesibandin, bi rastî dikare zehmetiyên dinyayê hilgire ser milê xwe, lê di heman demê de dikare li rêyên ku ji bin wan derkeve jî bigere.

Bi rastî jî ev heybera ku lawaz e bi nifşan desthilatdar e û jiyanê didomîne. Xwezaya dayikê, zimanê dayikê, her nirx bi dayiktiyê ve girêdayî ye. Dinya li gor dilê dayikê nayê. Lê vir û wir pergala despotîk qedera jinan xistiye pencên xwe.

Hemû tundiyên li ser jinê li dijî mirovahiyê tên dîtin. Herçiqas jin di dîroka mirovahiyê de weke çavkaniya jiyanê tê dîtin jî, her tim rastî şidetên cuda hatiye û tê. Her roj jinên di temenên cuda de rastî şideta hovane ya li derveyî mirovahiyê tên. Zilm, reng û awayê diyardeya xwe diguherîne, di rêyên cuda de tevgera xwe didomîne.

Qehreman her tim li dijî pergala mêtinger û baviksalarî derketine ku çalakiyên wan jî rastî tundiyê tên. Jinan ji carekê zêdetir jêhatîbûna xwe û ruhê xwe yê lehengiyê îspat kirine. Ji bo têkoşîna azadiyê canê xwe dane. Bi hezaran tevgerên azadiyê yên hatine avakirin bi fedaî têkoşîna xwe didomînin.

Rastiya şer û felaketên îroyîn nîşana têkçûn û paşketina pergala dîktatorî û kapîtalîst e, ku di encamê de rê li ber komkujiyan vedike. Di roja me de hejmara tawanên li dijî jinan zêde dibin.

Jin nifşan dide jiyandin û ger jinên azadîxwaz li dor armancekê bibin yek, wê demê dikarin van nêzîkatiyan ji holê rakin û bi ser bikevin. Lê ez pirsekê bikim. Ma Civakên Pîrî mehkûmî Stagnasyon an Kêmbûna Standardên Jiyanê ne? Dibe ku hinek kes wisa bawer bikin, lê ez ê nîqaş bikim ku guhertina rastiyên demografîk ên pîrbûnê dikare bi tevgerên adaptasyona wêrek bê pêşwazîkirin.

Çalakiyên ku balê dikişînin ser potansiyela nekarkirî ya mirovan hewce ne. Mînak; dibe ku çalakî bên kirin da ku jêhatîbûna zanîna mirovên pîr ji bo xebata hilberîner di jiyaneke xwedî xebateke demdirêj de bê xurtkirin.

Heger tevlîbûna jinan li qada siyaseta derve, di cewhera siyasetê de guhertinan çêneke jî wê demê tevlîbûna jinan a di jiyana siyasî û civakî ya navxweyî de dibe sedema guhertinên mezin.

Pêwîst e jin bi mêran re bibin xwedî derfeteke wekhev ji bo beşdarbûna jiyana civakî û siyasî, ji ber ku ev hemû bandoreke erênî li ser pêşketin û ewlehiya welêt dikin.


Di civakan de gelek caran têgihiştineke şaş heye ku jin xwedî risteke diyarkirî ye, ku bi giranî bi xemên malbatê ve girêdayî ye û argumana sereke ew e ku jin nikare çend tiştan bike. Nîqaşa ku jin nikare di artêşbûnê de baş bimeşe û derdor ne cihê jinê ye ev e.

Avaniya civakî, bi giştî, tevlîbûna piraniya jinan a jiyana giştî û siyasî sînordar dike. Di rastiyê de, rista jinan ne diyar e, girêdayî pêkhatina civakê ye û bi derfetên ku ji wan re tên peydakirin, jin dikarin siyaseta derve bimeşînin, beşên cuda yên aboriyê bi rê ve bibin. Divê jin li her qadê zêdetir bibin xwedî derfet ku civak jî ji kiryar û xebarên wan zêdetir sûd werdigire û azadtir û bi hêztir bibe.

# Rêber Apo amade ye lê dewlet?

## Rêberê PKKê Abdullah Ocalan di hemû hevdîtinên xwe de peyama çareseriyê daye û gotiye "Şert bên amadekirin û dewlet amade be, ez dikarim pirsgirêkê bi rêya aştî, demokrasî û muzakereyan çareser bikim"

| Navenda Nûçeyan



Rêberê PKKê Abdullah Ocalan ku piştî bi destên hêzên navneteweyî ji Sûriyeyê hat derxistin û di 15ê Sibata 1999an de radestî Tirkiyeyê hat kirin 26 salin li Girtîgeha Tîpa F a Ewlehiya Bilind a Îmraliyê di yek hucreyê de tê girtin. Ji hemû mafên xwe yên siyasî, çandî, civakî û mirovî bêpar hatiye hiştin. 26 salin di tecrîda girankirî de girtî ye. 26 sal in ji mafê zagonî û hiqûqî bêpar tê hiştin. 10 salin tevî ku DMMEê biryar daye ku Abdullah Ocalan ji mafê hêviyê sûdê bigere jî, Tirkiye zagonên xwe naguhere û destûr nade ku sûdê ji mafê heviyê bigire. Mafê radyo, televîzyon, rojname, ziyaretên malbat û parêzeran asteng kirin. Li gorî zagonan Abdullah Ocalan xwedî maf e ku her hefte bi parêzer û malbatê re hevdîtin bike. Di sala 1999an de Parêzer 60 caran, di 2000an de tenê 37, di sala 2001an de tenê 40, di 2002an de tenê 35, di 2003an de 21, di 2004an de 25, di 2005an de 14, di 2006an de tenê 22 caran çûn Îmraliyê û bi Abdullah Ocalan re hevdîtin kirin.

**Muxalefeta hewayê kirin hincet**

Di sala 2007an de xwestin Abdullah Ocalan jehrî bikin. Dîsa 3 caran cezayê Hucreyê li Abdullah Ocalan birîn. 22 hefteyan li ser hev serlêdana parêzeran hat redkirin. Bi hinceta muxalefeta hewayê heye destûr nedan ku parêzer û malbat biçin îmraliyê.

**Tecîdia di tecrîdê de**

Di Tîrmeha 2008an de bi awayekî fîzîkî mudawxaleyî Abdullah Ocalan kirin. Bêyî daxwaza wî porê wî ji kokê ve jêkirin. Abdullah Ocalan diyar kir ku dewlet bi vê yekê peyama 'Em kengî bixwazin dikarin te kontrol bikin. Di Cotmeha 2008an de dîsa Abdullah Ocalan li erdê dirêj kirin û îşkence lê kirin. Di heman salê de hucreya wî guhertin û xistin hucreyek biçûktir. Abdullah Ocalan ev wekî 'tecrîda di tecrîdê de' pênase kir.

**Hevdîtin bi tevahî qut kirin**

Ji sala 2008an heta 27ê Tîrmeha 2011an gelek serlêdanên parêzeran hatin redkirin. Hevdîtina parêzeran di navbera 2008-2011an de bi sînor hat kirin. Lê piştî 27e Tirmeha 2011an hevdîtina parêzeran bi temamî qut kirin. Parêzer 8 salan li ser hev rastî astengiya rayedaran hatin û nekarîbûn biçin Îmraliyê. Heta 2017an parêzeran 618 caran serî li dozgeriyê dan. Lê hemû serlêdanên wan hatin redkirin. Parêzeran di navbera 2017 û 2018an de 202 caran serlêdan kirin. Lê dîsa serlêdanên parêzeran red kirin.

**Berxwedana zindanan derî vekir**

Hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) Leyla Guven, di 8ê mijdara 2018an de ji bo rakirina tecrîda li ser Abdullah Ocalan, li Girtîgeha Tîpa E ya Amedê dest bi greva birçîbûnê kir. Grevê 200 rojan berdewam kir. Di 2ê gulana 2019an de ku grev didomiya, Abdullah Ocalan piştî 8 salan cara yekemîn bi parêzerên xwe re hevdîtin pêk anî. Di 22ê gulanê de Abdullah Ocalan bi parêzerên xwe re hevdîtina duyemîn pêk anî û bang kir ku çalakiya greva birçîbûnê bi dawî bibe. Li ser vê bangê çalakiya grevê bi dawî bû.

Piştî bidawîbûna çalakiya grevê, parêzer di 12 û 18ê hezîranê û 7ê tebaxê de dîsa bi Abdullah Ocalan re hevdîtin pêk anîn. Piştre dîsa deriyên Îmraliyê li parêzeran hatin girtin. Di sala 2019an de ji bo hevdîtinê 104 serlêdan hatin kirin, ji van serlêdanan tenê 5 jê hatin qebûlkirin û 67 serlêdan jî ne erênî ne jî neyînî nehatin bersivandin. 32 serlêdan jî hatin redkirin. Di 5 mehên destpêkê yên 2020an de jî 38 serlêdan hatine kirin. Di 26 salan de tenê 2 caran (27ê nisan 2020an û 25ê adara 2021an) destûra axaftina bi telefonê girtiye. Piştî axaftina telefonê ya 25ê adara 2021an 44 mehan bi tu awayî bi Abdullah Ocalan re têkilî nehat danîn û tecrîda mutlaq pêş ket. Ji 2014an heta niha tenê 6 caran malbat çûne hevdîtinê. Parêzer û malbatan ji bo biçin Îmraliyê heta 2024an bi giştî 169 caran serlêdan kirin. Lê serlêdan hemû bêbersîv hatin hiştin. Ji îlona 2018an heta niha bi hinceta "Qedexeya parêzeran heye" li ser hev 12 caran her ji 6 mehan carekê biryara qedexeya hevdîtina bi parêzeran re dane. Dîsa Midûriyeta Girtîgeha Îmraliyê ji îlona 2018an heta niha 23 caran her ji 3 mehan carekê cezayê dîsîplînê biriye.

**Hewldanên ji bo çareseriyê**

Piştî parêzeran di 2ê gulana 2019an de bi Rêberê PKKê Abdullah Ocalan re hevdîtin kir, peyam şand derve. Parêzer Newroz Uysal ku hevdîtin kir, peyama Abdullah Ocalan parve kir. Peyam wiha ye: "…Ev pêvajoya em têde ne pêvajoyeke dîrokî ye. Di vê pêvajoyê de pêdivî bi lihevhatineke kûr a civakî heye. Ji bo me aştiya bi rûmet û siyaseta demokratîk esas e. Ji bo çareserkirina pirsgirêkan, pêwîstiyeke xurt bi rêbazeke danûstandinên demokratîk heye. Em dikarin pirsgirêkên Tirkiyeyê û yên herêmê, ne bi şer û amûrên şîdeta fîzîkî, lê bi hêza nerm, yanî bi hêza aqil, polîtîk û çandî çareser bikin. Em di wê baweriyê de ne, di çarçoveya Hêzên Sûriyeya Demokratîk de, pirsgirêkên li Sûriyeyê dûrî çanda şer, di rewşa ku tê de ne di çarçoveya yekparebûna Sûriyeyê de bi perspektîfa demokrasiya xwecihî ya bi Destûra Bingehîn hatiye ewlekirin divê bên çareserkirin. Sekna me ya li Îmraliyê, biryardariya ji bo kûrkirina rêbaza ku di Danezana Newroza 2013an de hate ragihandin û domandina wê bi rengekî eşkere ye. Aştiyeke bi rûmet û çareseriya siyaseta demokratîk ji bo me esas e."

**'Bi vîneke xurt hevkariyê bikin'**

Parêzerên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan di 22ê gulana 2019an de hevdîtin kirin. Peyama Abdullah Ocalan a hevdîtinê wiha ye: "Di serî de hevalên ku bedena xwe dane ber rojiya mirinê û greva birçîbûnê û hevalên din, di çarçoveya ku parêzerên min bi berfirehî agahiyan bide we de, ez li bendê me ku hûn dawî li çalakiya xwe bînin. Ya girîng, ez hêvî dikim û li bendê me ku ji niha û şûnde hûn bi awayekî têr û vînek xurt hevkariyê bi min re bikin…"

**Bi înkar û îmhayê çareser nabe**

Di 5ê Hezîrana 2019an de Birayê Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan Mehmet Ocalan, çû Îmraliyê û hevdîtin kirin. Mehmet Ocalan der barê hevdîtinê de got: "Serok Ocalan got 'Divê gelê Bakurê Sûriyeyê ji bo azadiyê bêtir têbikoşe. Lê divê hemû gelê Sûriyeyê tev li vê têkoşîna azadiyê bibe. Divê ji bo Yekitiya Sûriyeyê hemû gelên Sûriyeyê jiyana hevpar ava bikin. Ger ku vê yekê pêş bixin û bi ser bikevin tu hêz bi wan nikare. Tirkiye ketiye pêvajoyeke ku xetimiye. Ji ber vê yekê Dewleta Tirkiyeyê bi polîtîkayên înkar û îmhayê nikare encam bigire. Li ser kuştin û mirinê çareserî pêş nakeve. Polîtîkayên îmhayê ne çareserî ne'."

Derfet bên dayîn çareserî hêsan e

Mehmet Ocalan anî ziman ku Abdullah Ocalan gotiye 'Ger ku derfetê bidin em dikarin vê rêyê vekin. Ev tişt bi şer û kuştinê çareser nabe. Ger ku hin qanal bi temamî vebin wê ev jî bo her kesî erênî be. Lê ger ku rê bên girtin wê ji bo her kesî pêşketinên neyînî bin.' Û bal kişand ser hewldanên çareseriyê.

**Tirk û kurd bêyî hev nabin**

Buroya Hiqûqê ya Asrinê têkildarî hevdîtina 12ê Hezîrana 2019an daxuyanî da û got: "Birêz Ocalan diyar kiriye ku ya esas digire tekoşîna jiyan û jiyandinê ye. Abdullah Ocalan da zanîn ku li gorî nîşana dîrokê tirk beyî kurdan û kurd jî bêyî tirkan nikarin bijîn. Dema li Mezopotamyayê kurd bên qedandin, li Anatoliyê li ser navê tirkan tu tişt namîne. Hebûn û pêşketina Kurdan û hebûna Tirkan bi hev ve girêdayi ye. Divê li gorî vê rastiyê tev bigerin. Ev yekîtiya Kurd û Tirkan, dê rê li pêş jiyana demokratîk û aştiyê ya gelên li Rojhilata Navîn jî veke."

**Şer pirsgirêka kurd girantir kiriye**

Buroya Hiqûqê ya Asrinê peyama Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan a 18ê hezîranê parve kir. Peyam wiha ye: "Derbarê pêvajoya çareseriyê de min qala helwesteke zelaltir û kûrtir kiribû. Min bi vê perspektîfê li geşedanên heyî nerî. Uslûba şer û dubendiyê ku mohra xwe li pêvajoya piştî bidawîbûna pêvajoya çareseriyê da û dubendiya kevneşop a Tirkiyeyê derbas nekir, derketiye holê ku di serî de pirsgirêka kurd û hemû pirsgirêkên civakî girantir kiriye. Divê bê dîtin ku siberojê dê pirsgirêkên civakî yên navxweyî, pirsgirêkên herêmî û global girantir bibin, lewma gelekî girîng û bi wate ye ku ev helwesta rêya sêyemîn bê parastin. Xeta li ser bingeha sê hîman; lihevkirina demokratîk, siyaseta azad û hiqûqa gerdûnê, platforma siyasî ya herî rast û hilberandina encamê ye. Bang li hemû hêzên pêwendîdar dikim ku di vê çarçoveyê de baldar bin."

**Peyama 7ê tebaxê**

Parezeran piştî hevdîtina 7ê tebaxê daxuyanî danû gotin: "Me 7ê tebaxa 2019an bi muwekîlê xwe Birêz Abdullah Ocalan re hevdîtinek pêk anî. Birêz Ocalan li ser rojevên sereke yên wek pêşketinên dîrokî, têkiliyên kurd û tirkan, gotubêjên li ser rewşa şer û rageşiyê axivî. Têkiliyên kurd-tirkan yên ji Exlat û Milazgirê destpê kir heta Destûra Bingehîn a 1921ê hatin nirxandin.Birêz Ocalan diyar dike ku têkildarî vê mijarê bi hestiyar hemû derdor divê li gorî wê tevbigere. Bal kişand ser windahiyên mirovî, siyasî û aborî yên çil sal in pêk tên, îsrara di vê polîtîkaya li herêmê de wê encamên hê girantir bi xwe re bîne, divê her kes vê yekê bibîne. Hewldanên demokratîk ên wî di dema Ozal de heta niha ji aliyê kontr-gerîlayan ve hatine sabotekirin; hêzên dijî çareseriyê îro jî ji bo heman tişt pêk bê di asteke ya şer derbixin de gihiştine potansiyelekê."

**16ê tebaxa 2019an**

Birayê Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan Mehmet Ocalan, di 12ê Tebaxê de çû Girava Îmraliyê û têkildarî hevdîtinê wiha got: "Serok ji min re got "Ev tişt bi şer nabe. Wê hem Tirkiye zerarê bibîne û hem jî gelên di nava hevde dijîn wê zerar bibînin. Divê aştî pêş bikeve. Ger ku Tirkiye têkeve axa Sûriyeyê ew jî nabe çareserî. Pirsgirêk divê bi demokrasiyê çareser bibin. Ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd em rol û erka xwe pêk tînin. Operasyona Pençe tê wateya şer. Ev mesele bi rijandina xwina mirovan çareser nabe. Em her dem ji bo aştiyê amade ne. Tirkiye bêyî herêma Federe ya Kurdistanê nikare bi ser bikeve. Divê her kes ji bo yekîtiya gelê Kurd di nava liv û tevgerê de be.

Abdullah Ocalan: Ez ji xwe bawerim

Mehmet Ocalan got "Birêz Ocalan dibêje tecrîda 20 salî ya li dijî wî bi şerên îro diqewimin ve girêdayî ye û dibêje 'Werin em pirsgirêka kurd çareser bikin. Ez dibêjim ku ez ê di hefteyekê de rewşa şer û îhtimala şer ji holê rakim. Ez ji xwe bawerim û ji bo çareseriyê amade me. Lê dewlet jî û aqilê dewletê jî divê tişta pêwîst bike."

**Hêza min heye, le tecrîd didome**

Abdullah Ocalan di hevdîtina 23ê cotmehê de gotibû "Tecrîd didome. Şert û merc bên avakirin hêza min a pratîk û teorîk heye ku ez vê pirsgirêkê ji zemîna şer derbasî zemîna siyasî û hiqûqî bikim." Di 28ê Kanûna 2024an de bi rêya heyetê peyam şand û xwest meclis, partiyên siyasî, rêxistinên civakî ji bo çareseriyê rola xwe bilîzin.

## DEWLETA TIRK TOLA DAIŞÊ HILTÎNE

# Gel ji bo av û axa xwe bûye mertal

■ Mehmet Alî Ertaş

*10 sal in Kobanê bi sembola berxwedana li dijî DAIŞê tê zanîn û nasîn. DAIŞê di 2014an de li Iraq û Sûriyeyê dest bi êrîşan kir. Di çileya 2014an de Reqa û di Hezîrana 2014an de Mûsilê girt. DAIŞê piştre Kobanê kir hedef. Êrîşên DAIŞê yên di 14-15ê îlona 2014an de li hemberî Kobanê hatin destpêkirin, 134 rojan dewam kirin. DAIŞ li vir rastî berxwedaneke mezin hat û taliyê têk çû. Bi hezaran ciwanên kurd û enternasyonalîst beşdarî pêngava rizgarkirina Kobanê bûn. Gelek ji wan di berxwedana dîrokî de jiyana xwe ji dest dan. Berxwedana dîrokî di 26ê çileya 2015an de bi serketinê bi dawî bû. Kobanê di wê rojê de bi temamî hat rizgarkirin. 10 sal derbas bûn lê êrîşên hewayî yên Tirkiyeyê li vir bi dawî nebûne. Hevseroka Desteya Rêveber a Ekolojiyê Almaz Romî têkildarî 10emîn salvegera rizgarkirina Kobanê pirsên me bersivand.*

***Beriya ku DAIŞ êrîşî Kobanê bike rewşa Kobanê çibû?***

Di 26ê çileya 2015an Kobanê ji destê DAIŞê rizgar bû. Em di serî de rizgarkirina Kobanê li hemû şehîdan, malbat û zarokên şehîdan pîroz dikim. Em li hemû şervanên YPG, YPJ û HSDê pîroz dikin. Di 2014an de berî çeteyên DAIŞê êrîşî kantona Kobanê bike, Kobanê bi milletê xwe yê kurd, rêveberiya xweser tê nasîn. Bajarekî biçûk bû. Beriya Şoreşa 19ê Tîrmehê Rejîma Baasê lê serwer bû. Di serdema Rejîma Baasê de gelê kurd li Kobanê di zor û zahmetiyên gelek mezin re derbas bû. Tu mafê kurdan nehatibû dayîn. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tevahî zordestî hebû. Lê bi taybetî li Kobanê zordestî zêdetir bû. Dema rejîma Baas ji Kobanê hat derxistin, gelê Kobanê û ciwanên Kobanê bi berxwedaneke herî fedaî têkoşiya. Ji bo xwe bi xwe bi rêve bibe, rêveberiya xwe îlan bikin. Cirûska şoreşa 19ê Tîrmehê ku li Kobanê pê ket, li hemû Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê belav bûn. Jin, ciwan û gelê Kobanê bi berxwedana xwe ya feadî, di demek kurt de rêveberiyên xwe îlan kirin û xwe bi xwe bi rêve bir. Di milê saziyan, milê leşkerî û milê rêveberiyê de bingeha xwe ava kirin. Di milê civakî û perwerdehiyê de pergala xwe ava kirin. Hemû sazî û dezgehên xwe ava kirin. Gel pergala ku li ser wan hatibû ferzkirin red kir û pergala xwe ava kir. Ji bo saziyên ziman, çand û perwerdehiyê ava bike, ket nava liv û tevgerê. Me dît ku dewleta tirk, rejîmê û çeteyên DAIŞê ev pergala Rêveberiya Demokratîk qebûl nekir û Kobonê xist dorpêçê. Ev pergala li vir hat avakirin, pergalek bi edalet, demokratîk, wekhev bû. Azadiya jinê têde mîsoger bûbû. Ji ber vê yekê gel lê xwedî derket. Lê Dewleta Tirk û çeteyên DAIŞê ev pergal qebûl nekir û êrîş kir. Piştî îlankirina Rêveberiya Xweser êrîş zêde bûn. Ji bo pergala Rêveberiya Xweser a Kobanê vala derxin dest bi êrîşan kirin.

***10 sal berê dema DAIŞê êrîşî Kobanê kir, li pişt DAIŞê kî hebû û çima êrîşî Kobanê kirin?***



Hevseroka Desteya Rêveber a Ekolojiyê Almaz Romî anî ziman ku çirûska Şoreşa 19ê Tîrmehe li Kobanê pê ket û belav bû û got: “DAIŞ li Kobanê têk çû. Dewleta Tirk ji bo tola xwe hilîne dixwaze dîsa Kobanê dorpêç bike û dagir bike. Lê gel ji bo ax û ava xwe, bûye mertal.”

Dema çeteyên DAIŞê êrîşî Kobanê kir, hevkarên wê hebûn. Wekî Dewleta Tirk hevkarên ku piştgiriya wan dikir hebûn. Ji ber çirûska Şoreşa 19ê Tîrmehê ji Kobanê dest pê kir û belav bû êrîş kirin. Rêveberiya Xweser ji Kobanê ve dest pê kir. Xwestin li Kobanê vîna gelê kurd bişkînin. Dixwazin kurd bêdeng bin û bi vîna xwe tev negerin. Dema êrîş kirin gotin ‘Dê di çend mehan de Kobanî bikeve.’ Me dît ku êrîşî Mûsilê kirin û dagir kirin. Êrîşî bajarên Iraqê û Sûriyê kirin. Reqqa, Dêrazor û Şedatê û Minbic di demek pir kin de dagir kirin. Lê bajarekî wekî Kobanê biçûk, 134 rojan li dijî DAIŞê li ber xwe da. Şervanên YPJû YPGê bi keleşên xwe li dijî çekên giran ên DAIŞê şer kirin û Kobanê parastin. Gelek şehîd hatin dayîn. Ciwanên kurd, xwe li dijî tang û topên DAIŞê û Dewleta Tirk de kirin mertalên zindî û Kobanê parastin. Ciwanên ji çar aliyê Kurdistanê derbasî Kobanê bûn, bi taybetî ciwanên Bakurê Kurdistanê ku derbasî Kobanê bûn û li dijî DAIŞê şer kirin, bû bersîva herî mezin a li dijî DAIŞê. Dewleta Tirk bi saetan û deqeyan li benda ketina Kobanê bû. Lê ew deqe û saet bû roj û heyv û Kobanê neket. Berxwedana ku jin û ciwanên kurd li Kobanê nîşan dan, hişt ku Kobanê nekeve. DAIŞ ji bo hemû cîhanê xeteriya herî mezin bû. Hemû gelê cîhanê hesabê xwe ji DAIŞê dikir. Ji ber ku di pergala DAIŞê de bûyerên serjêkirin, kuştin, şewitandin û bûyerên herî qirêj hebûn. Beriya ku derbasî bajaran bibin bi tirsa xwe û qirêjiya xwe bandor li ser mirovan dikir. Ji ber van komkujiyên DAIŞê her kes ji DAIŞê ditirsiya.

***Gelê kurd û şervanên kurd hêza xwe ji ku girt.***

Gelê kurd, şervanên kurd xwedî vîn û nasname ye. Tevgera kurd 50 salin ev vîn û berxwedana xwe îspat kiriye. Kurd xwedî hebûn, nasname û vîn in. Hêza me ji piştgiriya gelê me, ji mafdariya me tê. Xwedîderketina çar aliyên Kurdistanê ya Kobanê hêzek mezin da berxwedana şervanên YPJ û YPGê ku karibin çawa şer bikin û bersîv bidin êrîşan. Piştî DAIŞ ket Kobanê gelê Bakur û parçeyên Kurdistanê li ser sînor nobet girtin û piştgiriya xwe anîn ziman. Nobeta li ser sînor ji bo êrîşkaran bersîva herî baş bû.Bû moralekî xurt. Şervanên kurd dizanîbû ku gelê kurd li pişt wan e û bi wan re ye. DAIŞ bi destê şervanên YPG û YPJê li Kobanê şikest û têk çû. Beriya ku DAIŞ têkeve Kobanê hêzên koalîsyonê dikaribû bi teyaran li DAIŞ bixe. Lê ev nekirin. Berxwedana li Kobanê plana hêzên koalîsyonê guhert. Piştî berxwedana şervanên kurd balafirêr şer li DAIŞê xist. Hêza şervanên kurd, tax bi tax şer kirin û tax bi tax Kobanê ji destê DAIŞê rizgar kirin. Ji xwe 1ê Mijdarê ku bû roja piştgiriya berxwedana Kobanê li tevahiya cîhanê gel derketin û çalakî li dar xistin. Vê xwedîderketina gelên cîhanê îspat kir ku şervanên YPG û YPJê xwedî vîn û biryar in ku DAIŞê têk bibin. Îspat kir ku dikarin bi keleşên destê xwe jî li dijî tang û topên wan şer bikin. Berxwedana ku li Kobanê derket holê, hişt ku hemû cîhan qala Kobanê û vîna Kobanê bike. Berxwedana Kobanê hişt ku Kobanê bi cîhanê bide naskirin. Cîhanê dît ku bajarekî biçûk çawa dikare li dijî DAIŞê li ber xwe bide. Her kesî dît ku DAIŞa li cîhanê hatiye perwerdekirin û bi çekên herî pêşketî şer dikin, çawa li Kobanê têk çû.

***DAIŞê hêza xwe ji ku girt. Kê çima piştgirî da DAIŞê?***

DAIŞ hêzeke ku bi tena serê xwe nikarîbû şer bike. Hêzeke ku piştgiriya wê tune be, di demek nêzîk de tê şikandin. Piştgiriya wan a heri mezin û li ber çavan, piştgiriya Dewleta Tirk bû. Ew çekên giran ên li ser sînor dihatin derbaskirin, li ber çavan bû. Endamên wan mikur hatin ku li Tirkiyeyê perwerde dîtine. Hat dîtin ku ji Tirkiyeyê derbasî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bûne. DAIŞ hêzeke ku Dewleta Tirk ew perwerde kiriye ye. Hemû dewlet jî vê rastiyê zanin. DAIŞ îro jî hebûna xwe didomîne.

***Li Kobanê pergaleke çawa hat avakirin. Gel çawa xwe bi rêve dibe?***


Piştî DAIŞ li Kobanê şikest, şervanên YPG û YPJê roj bi roj bajarên din jî ji DAIŞê paqij kirin. Pajarên Minbic, Reqqa û Tebqa ji DAIŞe paqij kir. Dema Kobanê hat rizgarkirin, gel dîsa vegeriya Kobanê. Gelê Kobanê bi axa xwe, şehîdên xwe û nasnameya xwe ve girêdayî ye. Gelek malbat piştî vegeriyan, ji ber ku xaniyên wan hatibûn xerakirin, li teniştа mala xwe çadir vekirin. Di aliyê fizîkî de gelek zor û zahmetî dîtin. Lê di nava çend salan de ji nûve Rêveberiya Xweser avakirin. Bajar ji nûve ava kir û xwe bi rêve bir. Gelê bakurê Kurdistanê û şaredariyên bakur piştgiriyek mezin da. Em spasiya xwe ji wan re dikin. Rêveberiya Xweser di demek kin de ji nûve saziyên xwe ava kirin û gel xwe bi rê ve bir. Saziyên jinan, saziyên civakî û binesazî ava kirin û dest bi xebatê kirin. Dewleta Tirk dit ku dê projeya Rêveberiya Demokratîk û Xweseriya Demokratîk bi ser bikeve. Dît ku li Kobanê û bi giştî li Bakur û Rojhiatê Sûriyeyê dê dîsa bi ser bikeve, dest bi êrîşan kir. Dît ku di vê projeyê de demokrasî, edalet, wekheviya jin û mêr heye, dest bi êrîşan kir. Dewleta Tirk vê pergalê qebûl nakd û heta îro êrîşên xwe yên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê didomîne. Her tim êrîşî saziyên xizmetê û saziyên çavkaniyên jiyane dikin. Dixwazin vê projeyê têk bibin. Lê ev pergal êdî têk naçe. Ji ber ku gel ev pergal nas kiriye û xwe di vê pergalê de dibînin. Tenê gelê kurd li dora vê pergalê kom nabe. Gelên din jî vê projeyê qebûl dikin û li dora vê pergalê kom dibin. Kurd, ereb, tirkmen çerkes hemû pêkhate li vê pergalê xwedî derdikevin. Hebûna xwe di vê pergalê de dibînin. Ziman û perwerdehiya her kesî bi vê pergalê tê parastin. Di vê pergalê de edalet, demokraskî û wekhevî heye.

***Tirkiye çima êrîşî Bendava Tişrînê û çavkaniyên jiyanê dike?***

Piştî pergala Baas hat hilweşandin û HTŞê Sûrî kir bin kontrola xwe, Dewleta Tirk careke din xwest li vir nefes bistîne û li milê Minbic û Qereqozaxê xwe bi tevger kir. Armanca êrîşên li ser Bendava Tişrînê ewe ku çawa Kobanê dagir bikin. Ji ber ku DAIŞ li Kobanê têk çû, Dewleta Tirk vê yekê tehamûl nake û dixwaze tola wê hilîne. Ev ji bo wan bûye kul û ketiye dilê wan. Ji ber vê yekê dixwazin derfet û rêyekê bibînin êrîşî Kobanê bikin û dagir bikin. Me xwest em bi hilweşandina rejîmê kêfxweş bibin. Lê dewleta tirk ew firsend neda me ku em kêfxweş bibin. Di rojên ku Rejîma Baas hilweşiya dest bi êrîşan kir û heta îro jî êrîşên xwe didomîne. Li dijî erîşên dijwar, şervanên YPG, YPJ û HSDê berxwedanek mezin nîşan didin. Çeteyên girêdayî Dewleta Tirk êrîşî Bendava Tişrînê dikin. Dixwazin têxin kontrola xwe. Armanca êrîşên li dijî Tişrînê ew e ku Kobanê dorpêç bikin û piştre dagir bikin. Em dibînin ku her tim hincetê çêdikin û dixwazin êrîş bikin. Niha berxwedanek mezin û dîrokî li ser Bendava Tişrînê heye. Ez bi xwe şahidê vê berxwedanê me. Em çûn ser Bendava Tişrînê û me çar rojan li ser Bendava Tişrînê nobet girt. Dewleta Tirk bi êrîşan rê li pêşiya karwanê girt. 3 caran di nava gel de komkujî pêk anî. Ez şahidê wan komkujyanan im. Li ser rê êrîş kir û 2 kes şehîd kirin. Dema em çûn bendavê dîsa êrîş kirin. Dema gelê Kantona Firatê li ser bendavê nobet digirt êrîş kirin. Ji ber êrîşên li ser bendavê bajarê Kobanê 2 meh in bê av, bê kareba ye. Di nava zor û zahmetiyên mezin de dijî. Demsala zivistanê ye. Lê kareba tune ye. Gel zahmetiyên mezin dijî. Gel êdî vê yekê qebûl nake û berê xwe dide bendava Tişrînê û dixwaze êdî raya giştî û cîhanê li dijî van êrîşan bêdeng nemîne. Gel dibêjin em wekî gelê sivîl hatine li vir bendavê biparêzin. Dibêjin em hatine ax, av û ceyrana xwe biparêzin. Dema gel govend girtibû, Dewleta Tirk bi balafirên xwe careke din bombe kir. Dîsa hevalên me şehîd bûn û birîndar bûn. Li ruxmê van êrîşan roja din dîsa gel nobet û çalakiya xwe berdewam kir. Me xwest vê rastiyê li raya cîhanê re ragihînin. Me got em li vir in. Em hatine parastina av, ax û ceyrana xwe bikin. Em şehîd dibin, birîndar dibin. Lê mixabin dewletên cîhanê li hemberî vê bêdeng. Bûyerek biçûk li devereke din çêdibe, hemû hêzên mafên mirovan û hiqûqê seferber dibin. Lê li hemberî van êrîşan bêdeng in. Rojane li bendava Tişrînê komkujî çêdibe, lê kesek qala wê nake. Yên van komkujiyana dike Dewleta Tirk e, lê li dijî van komkujiyan bêdeng in.

**Banga we ji gelê kurd çiye?**

Banga me ji çar aliyê kurd û Kurdistanê ew e ku em yekîtiya xwe ava bikin. Ya din em bang li hemû rêxistinên mafên mirovan û hiqûqê dikin ku hesab ji Dewleta Tirk bipirsin û bixwazin Tirkiye ji Sûriyê derkevin.



Adar Jiyan

# Di guherîna zimên de sedemên civakî

Ziman wekî hebûneke candar e ku her gav pêdiviya wî bi guherînê heye û her tim li gor geşedanên civakî, çandî û aborî diguhere.

Bêguman di guherîna zimên de du sedemên bingehîn hene. Yek jê dînamîkên navxweyî û ya din jî bandora derveyî ye. Wekî hemû heyînên candar ziman jî hemû diguherin. Civaka ku diguhere, li gor hinek hewcedariyan zimanê wê jî diguhere.

Di lêkolînên civakî de, qada herî girîng a ku neçarî guherbariyê ye qada zimên e. Bi rastî pergaleke ku rasterê rê li ber guherîna zimên bigire hê nehatiye dîtin. Civaka ku dixwaze zimanê xwe tekûz bike û bandorê li zimanên din bike, divê pêşî nirxên xwe yên çandî hilberîne û amûrên zanîn û teknolojiyê li gor derfetên demê baş bi kar bîne. Guhertina zimanekî bi veguhastina peyvan dest pê dike. Pêşî bandorê li fonetîka (dengzaniya) zimên dike û paşê hemû hêmanên zimên dixe bin bandora xwe.

Em dixwazin di vê nivîsê de li ser hinek sedemên civakî yên ku bandorê li guherîna zimên dikin rawestin. Ji bo ku em derbarê guherîna zimanekî de tiştekî bibêjin, divê berî her tiştî taybetmendiyên wî zimanî û qonaxên ku tê re derbas bûne li ber çavan bigirin. Bi rastî her form, di encama xwezayî ya guherîna zimên de pêk tê.

Yek ji kevintirîn warê lêkolînê yê ku bi guherîna zimên mijûl dibe jî ravekirina avahiya zimên e. Hinek zimanzan, lêkolîner û dahûrînerên ku derbarê ravekirina qaîdeyên zimên de serê xwe diêşînin, dixwazin bi berdewamî di ziman de guhertinan pêk bînin. Tu têkiliya ku peyvek bi zorê yan bi zagon û qanûnan di civakê de were bikaranîn bi rastiya zimên re nîn e. Em vê yekê di daxwaza mamosteyên ku hinek peyvan li gor xwe diedilînin û bi xwendekarên xwe didin qebûlkirin de dibînin. Heçku peyvên di zimên de ne li gor biryar û daxwaza hinek kesan, li gor pêdiviya civakê tên bikaranîn û parastin.



**Di lêkolînên civakî de, qada herî girîng a ku neçarî guherbariyê ye qada zimên e. Wekî hemû heyînên candar ziman jî diguherin. Civaka ku diguhere, li gor hinek hewcedariyan zimanê wê jî diguhere**

Ziman her dem li gor hewcedariyên rojane û pêdiviyên civakê diguhere. Ji ber vê yekê jî divê em tenê di warê hevdemkirinê de li zimên nenihêrin. Wekî ku tê zanîn, guhertinên di zimên de ne tenê pêvajoyeke taybet a îroyîn e û ji aliyê zanistî ve jî diyardeyeke girîng e ku çend faktor tê de rista xwe bi cih tînin. Ji ber vê yekê, encameke tevlihev û tevahî derdikeve holê ku di warê zanistî de ravekirina wê zehmet e. Bi rastî derbarê sedemên guhertinên zimên de nihêrîneke hevpar jî tune ye. Gelek zimannas angaşt dikin ku hem pêkhateya navxweyî ya zimên û hem jî faktorên civakî yên ne zimanî di vir de roleke pir girîng dilîzin. Belê dîsa jî ne diyar e ku ji van herdu faktoran kîjan jê girîng e, kîjan jê serwer e. Kesên ku faktorên civakî yên ku ji ber sedema guherîna zimên pêk tên girîng dibînin diyar dikin ku guhertinên di qada civakî de pêk tên her gav xwe di zimên de jî didin der.

Hinek kes jî girêdana guhertinên zimanî yên bi guhertinên civakê re wekî derbaskirina sînorên zimannasiyê dibînin. Herdu nihêrîn jî ji bo ravekirina guherînên zimanî ne bes in. Lewre ya yekem avahiya taybet a zimên e ku ji hêla ramanê ve tê afirandin û bi şiyana xwe ya vegotin û têgihiştinê distewe. Ya duyemîn jî balê dikişîne ser taybetmendiya ragihandinê ya ziman û şêwaza vegotina taybet a şexsî diyar dike. Bi rastî herdu hêman jî di pêkhatin û guherîna zimên de roleke girîng dilîzin. Belê bi vî awayî li ser sedemên guherînên zimanî tenê hinek angaşt tên derpêşkirin. Di nihêrînên ku derbarê guhertinên zimên de têne pêşkêşkirin de, pergaleke taybet a zimanî li ber çavan tê girtin. Guhertin pêvajoyek e ku di pergala zimên de ji komeke qaîdeyan ên ku taybetmendiyên wate û pêkhateyên dengî li ber çavan digirin pêk tê. Bêguman, bi vê pêvajoyê re hinek encam û bandorên cuda derdikevin holê. Guherînên zimên bi avaniya deng û wateyê dest pê dike, bandorê li her hevoka zimên dike û hinek guhertinên nivîskî jî pêk tîne.

***Guherînên di zimên de wekî sê birên sereke tên diyarkirin:***

***1.*** Taybetmendiya rêzimanî; anku guherîna fonetîk (dengzanî), morfolojîk (peyvzanî) û sentaktîk (hevoksazî/gotinsazî). Ev guherîn bi tevahî girêdayî pergala zimên in.

***2.*** Guherîna semantîk/wateyî û ferhengî; daxwaza civakê ya ji bo guhertinê, li vir hinek caran rasterast/yekser hinek caran jî nerasterast/neyekser tê dîtin.

***3.*** Têkeliya ziman û zaravayan; rastiya ku guherînên zimanî bi sê awayan bandorê li ser ziman dike nîşan dide ku her guherinek zimanî du alî ye: Yek aliyê zimanî û ya din jî aliyê civakî ye. Di van herdu cureyên guherînan de ya girîng şert û merc in ku hem di pergala zimên de pêk tê û hem jî ji hêla civakê ve tê pejirandin. Dema ku guherînên rêzimanî û civakî tên dîtin, diyar dibe ku rolên cuda dilîzin û herdu jî di heman demê de derbasdar in.

Sedemên ku me heta niha diyar kirine hemû sedemên guhertinên rêzimanî ne. Reftara/bizava zimanî, tevgereke civakî ye û li gor hinek qaîdeyan tê tertîbkirin. Qebûlkirina nûkirina qaîdeyên navborî, bêtir girêdayî pêdivî, sûd û feydeyên civakê ne ku li gor rêzikên zimên tên edilandin. Qebûlkirina nûjeniyên di zimên de jî bi haybûna li gor qaîdeyên ziman pêkan dibe. Civak di vî warî de hinek caran gotin û bêjeyên nûjen û hinek caran jî gotin û bêjeyên klasîk/kevnare bi kar tîne. Di pêkhatina hişmendiya zimên de du faktorên ku roleke girîng dilîzin hene. Ya yekem ew e ku hişmendiya li gor pîvanên zimên, parçeyek ji hişmendiya li gor pîvanên civakî ye û bandorê li ser vegotinê dike. Ji bo vê jî pêdivî bi haydariya norma zimanî ya pêşverû heye. Ya duyemîn jî, haydariya li gor normên civakî ku rasterê bi têkiliyên civakî yên civakên ku bi heman zimanî diaxivin ve girêdayî ye. Têkiliyên civakî jî bandorê li ser pejirandin an jî redkirina guhertinên zimanî û rêzimanî dikin. Wekî mînak; di demên awarte, qeyran û aloziyan de qebûlkirina peyvan ji demên asayî, hêminî û aramiyê hêsantir e.

Guherîna zimên rasterê bi jiyana civakî ve girêdayî ye, belê ev nayê wê wateyê ku guherîna zimên tenê yekeya dengî pêk tîne. Guherînên di fonemê (yekdengiyê) de ne yekitiya ziman xirab dike, ne jî di danûstandina civakê de zehmetiyan derdixe. Ev jî di morfemê (yekteşeyê) de dibe sedema zêdebûneke xurtir.

***Wekî encam;*** nîşaneyên morfeme (yekteşeyê) bi piranî di paşgirên tewandî de peyda dibin û ev peydabûn wekî normên zimanî heman gavê dibin faktorên bingehîn. Aliyê ve yekê ye neyînî jî ew e ku bi taybetî hînbûna zimên û axaftinê hinekî zehmet dike. Ji aliyê din ve dema ku îro em li rewşa zimanê kurdî dinihêrin, guherînên dengnasiyê yên van salên dawiyê hem bandorkirina yekteşeyê û hem jî derfetên pêşketina zimên xurtir kirine. Têkiliyên civakî-zimanî yên ku bandorê li pêdiviya ragihandinê ya civakê dikin faktorên girîng ên encama van guhertinan in. Hemû faktorên ku li jor hatine rêzkirin, bandorên xwezayî yên têkildarî rêzimanê civakê ne ku ji hêla civakê ve hem tên pejirandin û bikaranîn û hem jî tên parastin.

Dîlber Hêma

# Helbesta eko-poetîk

Sînemager Andrey Tarkovsky gotiye "Helbest, felsefeyek e ku di tevahiya jiyana mirovan de bi wan re ye."

Ev felsefe, bi pergala rîtmîkî ya hest û ramanê, bi zêdekirina wateyekê li hesta herî kaotîkî ya mirov û bi hevgirtina kûrahî û livîna xwezayê xwe dide der.


Di vê wateyê de, naveroka gotara ku ez ê binivîsim dê li ser eko-helbestê bisekine ku ji nirxekî helbesta pastoralî ye.

Helbest hewldana komkirina tîpên lihevhatî ne, ku gerdûn, mexlûqên ku tê de dijîn û xwezayê bigihîne hev û paşê hestên kaotîkî yên mirovan lê zêde bike. Bi saya van hestan e ku xwendevan dê bikaribe pênc sehekên xwe bi pêş ve bixe. Helbesta şivanî (bi zimanê fransî pastorale), ew helbesta ku bedewiyên xwezayê vedibêje. Ev berhemên wêjeyî ne ku bi mebesta pêşkêşkirin û hezkirina mirovan ji jiyana gundîtî, şivantî û bedewiyên xwezayî ne. Ji helbesta ekolojîkî re weke binecureyekî helbesta şivanîtiyê, di wêjeyê de wêjeya ekolojîkî tê gotin. Ev cureyê wêjeya ku ji perspektîfa wêjeya ekolojîkî hatiye nivîsandin, ji gelek aliyan ve ji wêjeya xwezayî gelek cudahiyên wê hene.

Aliyê herî girîng ê helbesta ekolojîkî ew e ku mirov ji hawîrdora kaotîkî ya bajêr direvin û derbasî nava xwezayê dibin. Li şûna danasîna bedewiyên xwezayê, wekî lensekê nêzîkî wan dibin û wan nîşan didin.

Pirsgirêkên jîngehê yên ku di sedsala 20an de derketine holê, bûne sedema wêrankirina xwezayê û destpêkirina lêkolînên zanistên hawirdorê. Van zanistan hewl dane ku ji van pirsgirêkan re çareyan bibînin. Berçavgirtina vê pêşketinê di eko-estetîka hawirdorparêzî û di berhemên wêjeyî yên bi nêzîkatiyên cihêreng de û ji aliyê dîtir ve di helbestê de hevtayê wê heye. Ev helbestkar û nivîskarên ku di berhemên ku mirovan wekî hêmanên bingehîn ên jiyanê dihesibînin de, nîşandana jîngehê ne.

Bo nimûne, dema ku em li helbesta şivaniyê dinihêrin, ku koka wê ji helbestkarê yewnanî Hesiod (750-650 b.z.) an helbestkarê latînî Virgil (70-19 b.z.) an jî helbesta helbestkarê romantîkî yê ingilîzî William Wordsworth (1770-1850) hene. Em dibînin ku wan di serî de xwe ji civakê vekişandine û berê xwe ji çand,



dîrok û siyaseta îdeal dane gundan. Bo nimûne em malikekê ji helbesta William Wordsworth a bi navê Les Jonquilles (Nergis) bidin:

***Nêrgiz***
*Wek stêrk li ezmên teng in*
*Ya ku em li ser Rêya Şîrî birûskê dibînin,*
*Xwe dirêj kirin, bê valahî,*
*Li ber peravê, di qulika benderekê de.*
*Min bi awirekî bi hezaran ji wan dît, ez difikirim,*
*Serê xwe dihejînin, di reqsa xwe ya dîn de.*

Ji ber ku mijarên jîngehê mijarên helbestê ne û helbest li ser van mijaran e, bi rastî jî qeyrana avhewayê û wêrankirina xwezayê ku di serdema me de jî tê jiyîn û wekî eko-rexne, wêje bi van mijaran ve mijûl dibe. Ne tenê hesasiyet, belkî jî mirov bi helbesta ku eko-realîst û realîst e û li hemberî guherîn û geşbûna demê radiweste û tama helbestê jî ji van hêmanan pêk tê.

Di eko-helbestê de 'Dinya'ya di nava tevliheviyê de tê nûkirin û rêyek ji bo girêdan û adaptasyona bi cîhana resen re tê pêşniyazkirin. Cîhaneke ku li ser berdewamiya têkiliyên dînamîk û dewlemend hatiye çêkirin, cîhaneke ku em rojane wê paşguh dikin, eko-poetîka vê hunerê berfireh dike û bi balkişandina lêkolînên ekolojîkî ve tên nivîsandin.

Eko-poetîka wekî disîplîneke, peyvek ku ji goslingên yewnanî (xanî) û kevirê logoyê (peyv û aqil, raman) hatiye wergirtin. Ew lêkolîn dike ka mirov çawa li qada jiyanê bi cih bûne, "xanî" çawa hatine pênasekirin û çêkirin; bê çawa laş û cîhan her tim xwedî projeyeke berxwedanê ya dijberî xwesteka mirovî ya ronîkirina sînorên di navbera mirov û cîh û cîhên din de ye; û çawa hebûna laşî ya çalakiyên hestî û eko-poetîkayê ye. Di vê çarçoveyê de helbestkarê kurd ê klasîkî Feqiyê Teyran beriya 400 salan, dema ku ev bizava helbestî jî tunebû, di wan salan de ev helbest nivîsiye û bi vegotina xwe hestên xwe di şeklê eko-helbesteke de temam kiriye: Hestên li nav avê û axaftin û axaftina bi çûkan re û wek ku ji navê xwe jî tê famkirin. Helbestkar Feqiyê Teyran ku navê wî tê maneya "şagirtê çûkan", ev wek navdêr bi kar aniye. Feqiyê Teyran di helbesta Ey Av û Av wiha gotiye:

***Ey Av û Av***
*Ey av û av, ey av û av*
*Ma tu bi işq û muhbetê*
*Mewc û pêlan tavêy belav*
*Bê sekne û bê rahetê*

*Bê rahet û bê sekne yî*
*Yan aşiqê baxwe xwe yî*
*Yan şubhetê qelbê me yî*
*Ji işqa kê natebitê*

*Ji işqa kê her têy û têy*
*Heta kengî her bêy û bêy*
*Bo min bi bêje heyranê kê y*
*Da ez bizanim qisetê*

*Da ez bizanim vê surê*
*Ji hindekê heta purê*
*Ji meneya vê gurgurê*
*Ji kê ra dikî vê taetê*

# 'Dê azadiya Rêber Apo bixwazin'

| Navenda Nûçeyan

Di çarçoveya pêngava "Ji Abdullah Ocalan re zadî, ji pirsgirêka Kurd re çaresriya siyasî" di 21ê çileye de meşa dirêj dest pê kir. Meşê li Fransayê dest pê kir. Dê 15ê Sibatê li bajarê Strasbourgê bi dawî bibin. Meşa Dirêj ku weke temsîlkirina 26 salên dîlgirtina Rêberê PKKê Abdullah Ocalan dest pe kir, dê 26 bajaran, 26 rojan û bi 26 beşdarvanan heta 15ê Sibate bidome.

Hevseroka Federasyona Bakurê Almanyayê FED-DEMê Sabahat Ergîn diyar kir ku Meşa Dirêj a di çarçoveya 'Ji Rêber Apo re azadî, ji pirsgirêka kurd re çareseriya siyasî' di 21ê çile de li bajarê Lorient ê Fransayê hatiye destpêkirin û wiha got: "Armanca vê meşê, azadiya fizîkî ya Rêberê PKKê Abdullah Ocalan e. Em bi vê meşa dirêj dixwazin xwe bigînin her kesî. Em dixwazin deng û daxwazên xwe bigînin her kesî û ji bo azadiya mirovahiyê daxwazên xwe bînin ziman."

Sabahat Ergîn da zanîn ku îsal bi minasebeta 26emîn salên dîlgirtina Abdullah Ocalan meş li Fransayê dest pê dike û got: "Gelê kurd û gelên Ewropa 26 sal in meşên girseyî li dar dixin. Lê meşa îsal cûda ye. Ji ber ku azadiya fizîkî ya Rêber Apo tê xwestin. Meşa îsal bi beşdariya 26 kesan dest pê kiriye. Dê meş heta 15ê sibatê li Starsbûrê bi meşeke girseyî bi dawî bibe. Li Almanyayê jî dê ciwanên kurd û dostên kurdan di 10ê sibatê de dest bi meşê bikin û heta 15ê sibatê meşa xwe berdewam bikin. Dê milê Fransa û Almanyayê li Starsbûrê bigêjin hev û azadiya fiziki ya Rêber Apo bixwazin. Dê bixwazin tecrîd bi dawî bibe. Dê azadiya fizîkî ya Rêber Apo bixwazin."




Li 26 bajarên ewropayê 26 kesan dest bi meşa 26 rojan kirine. Dê bajar bi bajar felsefeya Rêberê PKKê Abdullah Ocalan parve bikin. Dê balê bikişînin ser tecrîd û azadiya fizîkî ya Rêber Abdullah Ocalan. Dê balê bikişînin ser êrîşên li ser Rojavayê Kurdistanê

Sabahat Ergîn bal kişand ser êrîşên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî û wiha axivî: "Ev êrîşên li Rojava ne tenê li ser gelê kurd, li ser hemû gelên bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêk tên. Ev êrîş li ser hemû jinên li ber xwe didin pêk tên. Êrîşek dijwar li ser fikr û bedena jinê tê kirin. Desthilata Dewleta Tirk dixwaze li Rojava mirovahiyê bifetisîne. Em dibêjin Şoreşa Rojava Şoreşa Jinê ye. Dixwazin li vir destkeftî û serkeftina jinê têk bibe. Jin û ciwanên kurd li vir têkoşînek mezin dide. Gel, dibêje em hene û em ê hebin. Ev ji bo me gelek girîn e. Êrîşên li ser Rojava tunekirina jinê, tunekirina mirovahiyê ye. Divê em li Ewropayê van êrîşan bidin xuyakirin û têkoşîna jinên kurd li cîhanê bidin naskirin. Êrîşên DAIŞê û Tirkiyeyê li dijî gelê kurd û jina azad e. Em bang li hemû mirovhaiyê dikin kut ev li ve meşê bibin û li dijî tunekirinê bibin deng.

**Dixwazin gel birçî û tî bihêlin**

Sabahat Ergîn bibîr xist ku dê di meşê de balê bikişînin ser komkujiyên li Bakur û Rojava û êrîşên li ser Bakur û Rojava û wiha berdewam kir: "Ev komkujiya ku li ser gelê kurd tê kirin, bi destê Dewleta Tirk pêk tê. Îro êrîşî çavkaniyên jiyanê yên wekî av û depoyên genim dikin. Dixwazin gel birçî û tî bihêlin. Komkujî tên kirin. Em wekî gelê li Ewropa li dijî vê yekê rojane çalakiyan li dar dixin. Ev komkujî bi destê dewleta tirk pêk tê. Em dixwazin gelê ewropa jî hişyar bikin ku li dijî van komkujiyan bêdeng nemînin. Gelê kurd bi salan rastî komkujyan tê. Lê êdî gelê kurd ne gelê berê ye. Êdî hişyar û zane bûye. Xwe bi rêxistin kiriye. Li dijî van êrîşan bêdeng namînin. Ev meş ji bo şikandina tecrîdê, pêşxistina demokrasiyê û çareseriyê ye. Gelê kurd êdî dixwaze bi têkoşîn, rêxistinbûn û çalakiyên xwe rê li pêşiya tecrîd û komkujiyê bigire û rêya azadiyê veke. Dixwaze bi demokrasî û dîplomasiya xwe ji bo hemû gelên cîhanê demokrasî û çareseriyê bîne. Ev meş li dijî komkujiyê ji bo hemû gelê cîhanê ye."



Kurdistan Lezgiyeva

## Li ser têgihîştina têgeha "dewlet-şaristaniyê"

Di roja me de ne tenê hêzên mezin, dewlet-şaristanî jî (di qonaxên pêşketina xwe yên cuda de) jî bi xwezaya xwe û rola xwe ya yekta di pergala têkiliyên navneteweyî de haydar in. Divê ev faktora girîng hem di dema avakirina têkiliyên bi wan welatan re, hem jî dema pêşbînîkirina reftarên wan de, di rewş û senaryoyên cûrbecûr de were hesibandin.

Têgîna nûvekirî ya Siyaseta Derve ya Rûsyayê (2023) di dîrokê de yekem car bi bikaranîna têgîna "dewlet-şaristanî" vedibêje, ku vê têgehê dixe nav axaftina fermî. Ev pênasîn dikare kûrahiya têgehî zêdetir bide reftarên Rûsyayê li cîhanê, nemaze li ber ku pêşketina kevneşopiya Ewropî de meyla ji hev cudakirina têgehên "dewlet" û "şaristaniyê" hebû.

Di cîhana nûjen de, çend welat hene ku mirov dikare ji wan re bibêje dewletên şaristaniyê. Di serî de ji ber faktorên dîrokî, çandî û jeopolîtîk, mînakên diyar ên vê diyardeyê Çîn û Hindistan in.

Çîn xwe wek şaristaniyeke cihê û yekta dihesibîne ku pêşketina wê di dirêjahiya dîrokê de rêyeke taybet şopandiye. Têgîna "dewleta şaristaniyê" di felsefeya siyasî ya Çînê ya nûjen de bi vî awayî di asta siyaseta derve û siyaseta navxweyî de xwe dide der.

Yek ji pîvanên sereke yên şaristanî-dewletê yek ji kevirên bingehîn ên siyaseta Çînê ya nûjen e. Mînaka herî balkêş jî di Destûra Bingehîn a Komara Gel a Çînê de ku di sala 2018'an de hatiye guherandin, mijara yekbûna bi Taywanê re cih girtiye.

Siyaseta derve ya Çînê ne tenê berteka Çînê ya li hember bûyerên rojane û "reelpolîtîka" bi şeklê wê yê herî paqij e. Pergala wê ya nirxên siyasî û taybetmendiyên tevgerê rasterast ji felsefeya siyasî ya klasîk a şaristaniya çînî peyda dibe, ku tê de bi kevneşopî giraniyeke taybet li ser yekîtî û lihevhatinê hate danîn, û Çîn bixwe wekî navenda jêrpergaleke taybetî ya têkiliyên navneteweyî hate hesibandin. Bê guman, di nav sedsalan de, cîhanbûyîna çînî di pêşketineke neçar de derbas bûye, lê bingeha tevgera çînî ku di demên kevnar de hatiye çêkirin, îro jî dikare were şopandin.

Hindistan di cîhana nûjen de mînakek din a zelal a netewe û şaristaniya hêzdar e. Tevî çend sedsalan girêdayîbûna kolonyal a li ser Împaratoriya Brîtanî, wê karibû orîjînaliya xwe biparêze û niha di pêvajoyeke bilindbûnê de ye. Bi gelemperî wekî demokrasiya herî mezin a li ser rûyê erdê û yek ji welatên herî cihêreng ên cîhanê tê binavkirin. Komara Hindistanê xwedî gelek nîşanên dewleteke şaristanî ye, lê mîna Çînê, ew vê yekê bi aşkere di belgeyên xwe yên fermî de diyar nake.

Bê guman dema ku Hindistan şaristaniyeke, statuya wê ya wekî "dewleta şaristaniyê" bêtir mijara nîqaşê ye. Ji ber faktorên objektîv ên dîrokî, derve û hundir, ew di pêvajoya aşkerekirina potansiyela xwe ya dewlet-şaristanî ya tam de ye, lê hîn ji hin "merhaleyek" derbas nebûye, piştî ku bêyî tu şert û merc dikare were ragihandin ku ev pêvajo qediya.

Gav bi gav, aliyê şaristanî dê girîngî û têkildariyeke hîn mezintir bi dest bixe- her ku em derbasî nîzameke cîhanî ya pirpolar dibin- dê rola van navendên hêzê bi xwezayî veguheze û gerdûnîtir bibe. Ev tê wê wateyê ku ji bo misogerkirina xebata rast û birêkûpêk a pergaleke wiha, divê mirov fêr bibe ku bi qasî ku gengaz be ne tenê berjewendîyên neteweyî yên welatên ku dê di pêşerojê de bibin hêmanên wê yên sereke, lê her wiha awayê wan yê yekta jî fam bike bi taybet raman û dîtina dinyayê. Ev ji kevneşopiyên wan ên şaristanî yên taybetî derdikeve û ji ber vê yekê her gav nikare bi prîzma rastiyên wê demê were ravekirin. Bi gotineke din, di rewşa dewletên şaristanî de, di îmaja paşeroja ne ewqas dûr de dibe ku bibe hêmana duyemîn a vê têgehê.



Xweşkanî
Felemez Ulug

# Alerjiya li dijî demokrasiyê

Heyeta Îmraliyê hevdîtina xwe ya duyemîn bi Rêber Apo re pêk anî. Hevdîtin 22'yê çileyê pêk hat. Parlamanterên DEM Partî pervîn Buldan û Sirri Sureyya Onder çûbûn giravê. Hat ragihandin ku endamê heyetê Ahmet Turk, ji ber rewşa wî ya tenduristiyê ne başbû di hevdîtinê de cihê xwe ne girtiye. Detayên derbarê şande û hevdîtina bi Rêber Apo re, ne tenê gelê Kurd û aliyên demokratîk hemû derdorên cûda ji nêz ve eleqedar dike. Lewma bala herkesî li ser peyamên Rêber Apo ye.

Gelê Kurd û gelên herêmê di serdemeke dîrokî de ne. Bi taybetî jî her agahî. Her peyama ji Rêber Apo tê, hêviya mezinkirina têkoşîna azadiyê û serketinê bi xwe re tîne. 2 hevdîtinên girîng û dîrokî li zindana Îmraliyê pêk hatin. Çav û dilê her kesî li daxuyaniya heyeta DEM Partî ya Îmraliyê têkildarî hevdîtina doh de bû. Heyetê piştî hevdîtinê bi rojekê daxuyaniyeke kurt da û got: "Birêz Abdullah Ocalan xebatên xwe didomîne. Di encama vê pêvajoyê de em ê hemû bi hev re azad bibin."

Bêgûman têkoşîna gelê Kurd û hêzên demokrasiyê hişt ku deriyê Îmraliyê vebe. Ev hevdîtinên ku piştî demek dirêj bi Rêber Apo pê hat, ji bo silametiya herêmê xwedî girîngiyek mezin e. Bi taybet di vê serdama ku li Rojhilata Navîn planên nû di dewre de ne nerîn û peyamên Rêber Apo ji bo silametiya herêmê ji her demê zêdetir xwedî girîngiyek mezin in.

Rêber Apo gelek caran got: "Ger derfet li pêşiya min vebe ez dikarim di nava hefteyekê de pirsgirêka Kurd çarser bikim." Rêber Apo di hevdîtina li gel Omer Ocalan jî îşaret bi



vê kiri bû û gotibû. "Tecrîd dewam dike. Heke şert û merc çêbin, ez xwedî wê hêza teorîk û pratîk im, ku vê pêvajoyê ji şer û şîdetê bikişînim ser bingeha huqûqî û siyasî." Di van peyaman de diyar dibe ku Rêber Apo li ser gotina xwe ye. Tevî pergala êşkence û qirkirinê ya li Îmraliyê, şerê psîkolojîk û taybet ên li ser tê meşandin jî ew tu carî ji doza xwe şaş nebûye.

Tevî van hemû hewldanên li dijî peymanên navneteweyî û mafên mirovan jî Rêber Apo deriyê diyalogê vekirî hişt. Ji bo aştiya gelan û çareseriya doza Kurd ew herdem di nava têkoşînek topyekun de bû. Bi nerîn û paradîgmaya Netewa Demokratîk, Ekolojîk û Azadiya Jinê ew ji bo hemû gelan bû çavkaniya moral û jiyana azad. Ne tenê li Kurdistanê li çar aliyên cîhanê ji gelek derdorên cûda, kesayetên nakirî û tevgerên azadîxwaz li wê paradîgmayê xwedî derdikevin. Ev xwedî kerketin roj bi roj navê Rêber Apo mezintir kir û ji sînorên hatine çêkirin derxist. Lewma îro Rêber Apo temsîla fikrekî ku bi mîlyonan jê bawer dikin dike. Divê nêzîkatiya li himberî wî jî li gorî vê rastiyê be.

Dewleta Tirk a dagirker û deshilata wê ya qirker di şexsê gelê Kurd de li dijî rastiya Rêber Apo derdikeve. Rastiya ku Rêber Apo û gelê Kurd daye avakirin êdî bandorê bi her awayî li herêmê dike. Xwedî derketina hêzên azadîxwaz û demokrat dihêle ku ev belavî tevahiya cîhanê bibe. Lê tevî vê jî dewlata Tirk dev ji siyaseta xwe ya înkar û îmhayê bernadaye.

Rêber Apo di parêznameya xwe ya beşa 5'emîn de balê dikşîne ser dijberiya dewletê ya li himberî demokrasiyê û dibêje; "Divê dewleta Tirk alerjiya xwe ya li dijî demokrasiyê bide aliyekî. Naxwe wê Tevgera Azadiya Kurdistanê wê bi xwe çarenûsa xwe diyar bike."

Weke di vê tespîtê de diyar dibe dewleta uniter ku xwe dispêre 'yek al', 'yek ziman', 'yek welat', 'yek dewlet' ne mumkune bikaribe di nava xwe de li gorî pêwîstiyên civakê demokrasiyê pêş bike. Ger di warê fikrî û yasayî de rengên cûda ên welat neyên qebûl kirin, hebûna wan li ser bingehê qanûnî neyê qebûlkirin, ne mumkune ku Tirkiye xwe ji vê zîhniyeta yekperestiyê rizgar bike û pêşî li demokrasiyê veke. Ji bo derbaskirna van jî pêwîste pêşî têgeha netewe-delweta rast bê destgiritn û derbaskirin. Bi taybet li Tirkiyê dewleta ku li ser înkara gelan hatiye avakirin diyare êdî nikare ji pêdiviyên demê re bibe bersiv. Ji bo ku gelên li Tirkiyeyê di vê serdema ku nexeşeyên herêmê tên guhertin bikaribin xwedî li nasname û hebûna xwe derkevin divê pêşî li dermokrasiyê vekin. Diyare ku ger dev ji vê alerjiya xwe ya demokrasiyê bernedin wê bedelên giran bên dayîn.

Ji vî aliyî ve hevdîtinên ku bi Rêber Apo re pêk tên wê pêşî li demoratîkbûna Tirkiyeyê jî veke. Ger ev pêvajo weke Reber Apo dibêje bi silametî pêşbikeve wê bandorê li siyaseta herêmê jî bike. Ji ber vê yekê divê herkesê ku alîgirê aştî, demokrasî û yekgirtinê ye divê xwedî li peyamên Rêber Apo derkeve û hêz bide van peyaman. Ger di vê çarçoveyê de nêzîkatiyek were pêşxistin ez di wê baweriyê de me ku wê deshilata heyî jî neçar bimîne gavan bavêje. Em ji bîr nekin hemû deshilat li gorî sekin û helwesta civakî helwestê xwe diyar diyar dikin. Divê helwesta civakê jî rê li ber xweferzkirinên vê desthilatê bigre.

# 26 sal-26 bajar-26 kes-26 roj

## Meşa yekemîn a îsal ku li bin navê '26 bajar, 26 kes û 26 roj' li Fransa bajarê Lorient/Lannesterê di dîroka 21ê çileyê de dest pê kir. Meşa dirêj dê di 15ê Sibatê de li bajarê Fransayê Strasbourgê bi dawî bibe



Siyamed Sîpan



Wek ku tê zanîn 'Meşên Dirêj' li Ewropayê êdî bûne wek kevneşopiyekê ku hema bibêje her sal li welatekî Ewropayê pêk tên û bi taybetî li bajarê Strasbourg ê jî bi dawî dibin.

Îsal jî dîsa Meşên Dirêj dê pêk werin. Di vê nivîsê de dixwazim bahsa 2 meşên dirêj ên girîng bikim û herwiha armancên wan bi were parve bikim. Ev meşên dirêj her sal bi armancên cur bi cur tên organîzekirin.

Meşa yekemîn a îsal ku li bin navê '26 bajar, 26 kes û 26 roj' li Fransa bajarê Lorient/Lannesterê di dîroka 21ê çileyê de dest pê kir. Meşa dirêj dê di 15ê sibatê de li bajarê Fransayê Strasbourgê bi dawî bibe.

Ji bo ku balê bikişînin ser tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku ev 26 sal in di zindanê de ye, ji 26 bajarên Fransayê, 26 Kurdistanî dê 26 rojan meşeke dirêj li dar bixin. Meşa dirêj dê di 15ê meha sibatê de li bajarê Strasbourgê bi dawî bibe. Bajarê Strasbourgê ne tenê ji bo hemû Ewropiyan, herwiha ji bo hemû kurdistaniyan jî pir girîng e. Ji ber ku Parlementoya Ewropayê li vî bajarî ye, Dadigeha Mafên Mirovan a Ewropayê li vî bajarî ye, gelek saziyên ku li ser YE (Yekîtiya Ewropa) yê ne wek CPT li vî bajarî ne. Ji bo wê jî Strasbourg her dem bûye qada meş, çalakî û xwepêşandanên kurdan.

Ne tenê hejmara 26 balê dikişîne ser xwe, herwiha armanc û axaftinên çalakiyê jî gelek girîng in. Wek ku tê zanîn îsal 26emîn salvegera komploya navdewletî ye. Ji bo ku êdî vê komployê pûç û rûreş bikin, dibê ku îsal li her deveran çalakî bilind bibin ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd. Em di demeke gelekî dîrokî re derbas dibin. Kiryar û biryarên ku em ê îsal bidin û pêk bînin, dê pêşeroja me diyar bike. Dê diyar bike ka dê ev 50 heya 100 salên pêşiya me çawa bin. Ji bo ku ev pêk bê jî, dê di van 26 rojan de li her bajarî hevdîtinên dîplomasiyê bên kirin. Kar û xebatên dîplomasiyê gelek girîng in. Ku em karibin çalakiya xwe baş bînin zimên, baş bidin nasîn, em ê bikaribin bigihijin armanca wê jî. Ji bo wê jî ez gelek girîngî didim kar û xebatên dîplomasiyê. Çalakvan hîna di roja destpêkê de bi rayedarên hikumetê û herwiha bi saziyên civakî re jî hevdîtin pêk anîne. Bêgûman ev jî gelek girîng e.


Ji aliyê din ve jî bi hezaran belavok tên belavkirin, bi dehan axaftin û hevdîtin dê bên kirin. Dirûşmekê bala min kişand, ew jî ew bû ku hemû çalakvan dibêjin "Pêwîst e em di vê dema dîrokî de, ji bo çareserkirina pirsgrêka kurd, destê Rêberê xwe xurt bikin!"

Meşa dirêj a din jî dê li Elmanyayê li bajarê Heilbronnê di 9ê sibatê de dest pê bike. Ev meşa dirêj jî dê bi heman armanc û dirûşmê dest pê bike û dê di 15ê sibat'ê de li bajarê Fransayê Strasbourgê bi dawî bibe.

Ji bilî van çalakiyan herwiha van gelek salên dirêj in li pêşiya Parlementoyê çalakiya konvedanê anku standvekirinê hebû. Lê çalakiya herî mezin dê dîsa meşa mezin dê di 15ê sibat ê de pêk bê. Wek her sal hemû kurdên ku li Ewropayê dijîn dîsa dê ber bi Strasbourgê biherikin û dilsoziya xwe ya ji bo Rêberê xwe bînin zimên.

Wek ku me gotî em di demeke dîrokî de derbas dibin. Hem xeteriyên demên wiha pir mezin in, hem jî derfetên qezenckirinê pir mezin in. Bi xwedîlêderketina li Rojava, bi xwedîlêderketina li vîna xwe ya siyasî ku bi azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ve girêdayî ye, dê sala 2025an bibe ***SALA AZADIYA GELÊ KURD!***

# Li hundir û derve tifaq



Hesen Huseyîn Denîz

Peyva tifaq dikare wek piştgirî, hevalbendî, hevgirtin, yekbûn, yekgirtin were pênasekirin, ku di van rojan de pêwîstiya kurdan ji ya hemû kesan zêdetir pê heye.

Li rojavayê Kurdistanê pêşketinên wiha girîng û hêvîdar çêdibin, ku berdewamî û xurtkirina wan wê ji kurdan re siberojeke ronîtir bi xwe re bîne.

Hevdîtinên navxweyî yên di navbera birêz Barzanî û birêz Mazlûm Abdî de tirs û xofên di nav kurdan de yên digotin, "Kurd nayên ba hev" şikand û aveke hênik berda ser dilê kurdan û ewqas jî bû kelemê çavê neyaran. A girîng berdewamkirin û xurtkirina vê ya di riya Kurdistanê de ye. Divê ji bo rizgariya Kurdistanê her rê û rêbaz were ceribandin û her awayê fedekariyê bê dudilî were nîşandan. Berjewendiya rizgariya Kurdistanê di ser a hemû partî, rêxistin û kesayetan re ye. Ger Kurdistan hebe, birêz Barzanî jî wê hebe, ger Kurdistan hebe, birêz Mazlûm jî wê hebe, ger Kurdistan nebe, kes ji me jî wê nebe. Ev rastiya welatê me û gelê me ye. Ji bo wê divê hemû kurd ji kîjan siyaset, partî, parçe, alî, ol, bawerî û rêxistinê dibin bila bibin, bi dirûşma 'Bijî Kurdistan' tifaqan saz bikin û bi ber armancê ve yekgirtî û bi hev re bimeşin.

Ji derveyî welêt jî hatina heyetên Ewropî ya gel birêz Mazlûm Abdî û bi taybetî axavtina li ser telefonê ya serokê Amerîka birêz Trump û bi serbilindî behskirina birêz Mazlûm ciyê şanaziyê ye. Serdana jinên kurd a li Qesra Spî jî jixwe agir berda dilê neyaran. Di dilê neyaran de, wiha dihizirîn û maf didan xwe, ku tenê wan dikarî bi Amerîkayê re têkiliyan deynin û dîplomasiyê bikin. Ger kurdan hewl bida bi Amerîkayê re hevalbendiyê bikin, ev dibû helwesteke rûreşiyê, lê ger tirkan kiriba ev jî dibû helwesteke dostaniyê. Ev heftê sal in ev yek ji aliyê Dewleta Tirk ve wiha dihat bikaranîn, ji wê re heq, ji kurdan re neheq bû, lê çûna Amerîkayê ya endamên rayedariya Rojava ev bêbextî jî çirand û ji dost û dijminan re da diyarkirin ku êdî kurd jî li qada dîplomasî û têkiliyan dikarin danûstendinê bikin û ev mafê wan ê herî bingehîn e. De bila Dewleta Tirk biteqe.

Divê aliyê kurdan hemû argûmant û çekên di destê tirkan de bi xwe jî bi kar bînin. Hêza leşkerî ya rojavayê Kurdistanê YPG, YPJ dikare serî li NATOyê bide û endamtiyê daxwaz bike, da ku ev çek jî ji destê tirkan derkeve. Dewleta Tirk bi piştgiriya NATOyê, bi çek û hêza ku ji wan digire ev 70 sal in êrîşî ser kurdan dike.

Ger îroj tirk bê tirs firokeyên xwe radikin û li Rojava, gelê me yê mezlum bombebaran dikin, axa me dagir dikin, sererd û binerdê me talan dikin, piştgiriya xwe ji NATOyê distînin. Tirk ji NATOyê re dibêjin, "Em baskê te yê Rojhilat û Başûr in, em çeka te ya li Rojhilata Navîn in, tu destekê bide me, em jî berjewendiyên te li Rojhilata Navîn û bi taybetî li dijî Rûsyayê biparêzin." NATO jî li ser vê pêşkêşiyê devê xezîneya çekan jê re vedike, piştgiriya wê dike û alîkariyê dide wê.

Tirk jî bi vê piştgirî û alîkariya ku ji NATOyê distînin kurdan qir dikin. Wê demê divê kurd vê derewa tirkan betal bikin û çeka ku bi kar tîne ji destan derxin. Ey NATO, ey Ewropa, ey Amerîka li ser axa me, ger berjewendiyeke we hebe, werin em bi hev re biaxivin û em piştgiriya we bikin, em berjewendiya we biparêzin, lê bes bi neyar û kujêrên me re nebin hevalbend û piştgir û nebin şirîkê kuştina gelê me. Çawa ku me giştiya Ewropayê ji xetareya terorizma DAIŞê parast, em dikarin berjewendiyên we jî li dijî dewletên din biparêzin. Ev heftê sal in hûn destekê didin dagirkerên Dewleta Tirk û ew jî me qir dikin, werin dev ji vê tifaqa qirêj berdin û li ser bingeha mirovhezî, dostanî û hevalbendî tifaqeke pak û nû bi me re saz bikin.

Gava NATO piştgiriyê nede Dewleta Tirk, ew ê nikaribe ewqas li ber çavên cîhanê û hovane sivan qir bike. Neyar ji piştgiriya distîne ewqas jixwebawer e ku dikare dîmenên kuştina sivîlan bê tirs parve bike. Di rastiyê de ev dîmen tenê dikare Dewleta Tirk bibe ber destê Dadgeha Mafê Mirovan û Dadgeha Darezandina Sûcên Şer. Lê ji bo vê, divê hemû parêzer û hiqûqnasên kurd serî li van dadgehan bidin û yek li hêviya yekî din nemîne û wek doza Roboskiyê di ser serê xwe re navêjin û piştre nebêjin diviya wî bikira, diviya yê din bikira û demê derbas nekin. Sûcekî ber bi çav heye, Dewleta Tirk bi dronên xwe li kesên sîvîl ên xwe kirine mertalên zindî dide, wan dikuje û van dîmenan belav dike. Ev tev sûcên şerî ne. Çawa ku kesek gotinekê li dijî serokomarê Dewleta Tirk dibêje, di cî de dozger û parêzerên wî dozê vedikin û serî li dadgehê didin, divê hiqûqnas û parêzerên kurd jî her yek ji aliyê xwe ve, bi insiyatîfa xwe, bêyî ku yek li hêviya yekî din bimîne, ji hev hêvî bikin, bi xwe materyalan kom bikin û pêşkêşî van dadgehên li sûcên şer û mafên mirovan dinihêrin bidin. Bi hezaran dosye dikarin di nava çend rojan de bigihijin ber destê van dadgehan.

Divê kurd ne tenê li kolanan bimeşin û biqîrin, divê di qada dadgehî de jî li mafê xwe bigerin û vê yekê ji sazî, rêxistin û partiyan hêvî nekin. Tu parêzereke/î kurd î, tu li Ewropayê dijî, tu zagonên dadgeha mafê mirovan û dadgeha sûcên şer dizanî, li ber destê te bi hezaran dîmen, nûçe û wêneyên kuştina kurdên sîvîl û bombebarankirina binesaziya gelê Rojavayê hene. Fermo wan bi kar bîne û serî li van dadgehan bide, da pêşî li êrîşên Dewleta Tirk werin girtin.

Şervanên kurd ev ji mehekê zêdetir e li derdora bendava Tişrînê di şerekî mirin û mayînê de ne. Ev mehek e bi şev û roj ji bo parastina rûmeta kurdan şer dikin. Bi piranî ev mehek e kincên xwe neguhertine, serê xwe neşuştine û bi xewa yek du saetan bi berdewamî parastina gelê xwe û axa xwe dikin. Gelê me di hawara wan de diçe û xwe dike mertalên zindî da Dewleta Tirk vî şerê qirêj rawestîne.

Tu jî ji aliyê xwe ve destê xwe bide vê tifaqê, keda xwe tev lê bike û mafê Bavê Teyar û bi dehan kurdên ku bedena xwe dane ber guleyên neyar li qada navdewletî bîne ser zimên û biparêze. Divê qada şer, qada dîplomasî, qada siyasî û qada hiqûqî dest bidin hev, ku em karibin vî neyarê hov û xwînxwar rawestînin.

Dem dema tifaqê ye, hemû kurd li kîjan parçeyê Kurdistanê dibin bila bibin, li kîjan aliyê cîhanê dibin bila bibin, hemû hêz û jêhatiniya xwe biherikînin bin xizmeta rizgariya Kurdistanê.

Em tev bi hev re welatê xwe rizgar bikin û tev bi hev re xweşiya jiyîna li welatekî azad bi hev re bijîn. Divê ne tenê şervanên YPJ û YPGê û gelê me yê Rojava têbikoşe, divê em kurd tev têbikoşin, li qada dîplomasî, li qada siyasî, li qada aborî û li qada hiqûqî. Pir girîng e, ku kirinên Dewleta Tirk ên li rojavayê Kurdistanê ji her alî ve ragihînin dadgehên ku bi vî karî re mijûl dibin û encam were bidestxistin, çepera li dor Dewleta Tirk hatiye hûnandin were tengkirin û fetisandina wê misoger bibe, da gelê me jî hilmeke azad bistîne.



# Lavrov çi dibêje?

Aramê Elegezê

Di 13ê çileyê de Wezîrê Karên Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov li ser ekranên TVyan nirxandinên sala borî kir. Di van nirxandinan de gelek mijarên ku di nav salê de qewimîbûn bi lêv kir, li gor xwe şîrovê kir.

Di van nirxandinên Lavrov de ya bala raya kurdan kişand mijara 'Iraq û Tirkiye destûr nadin avakirina Dewleta Kurdan' bû. Baş e, di vê pêvajoyê de tu aliyên siyasî yên kurd jî behsa avakirina dewletekî kurdan nekiriye. Tişta ku diqewime ew e ku li ser neteweya kurd komkujî û nifşkujiyek pêk tê. Kurd hewl didin ku hebûna xwe biparêzin û mayînde bikin. Ên ku dixwazin neteweya kurd ji holê rakin û ji bo vê jî her roj êrîş dikin Dewleta Tirk û Dewleta Îranê ne. Lê Wezîrê Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov li cihê ku êrîşkaran vebêje, qurbaniyên van êrîşan tawanbar dike, gefan li wan dixwe, wan hedef nîşan dide.

Başe Lavrov çima navê Iraqê û Tirkiyeyê bi hev re bi lêv dike? Di rastiyê de rewşeke ku Iraq destûrê nede kurdan nîn e; ji ber ku Iraqê destûra federasyona neteweya kurd pejirandiye, serokkomar û wezîrê derve yê Iraqê di opozîsyona kurdan de cih digirin. Anku ev angaşt polîtîk e, hînek tiştan perdepoş dike. Ya tê perdepoşkirin Îran e. Lavrov aşkera navê Îranê nade. Ji ber ku Îran hevalbendê wan e. Li vê pêvajoyê de naxwazin kurd li dijî Îranê bikevin nav liv û tevgerekî. Lê hem em wek kurd baş dizanin hem jî Lavrov dizane ku di mijara kurd û Kurdistanê de peymana Qesr-i Şîrîn heta îro Sefawî-Osmanî, Îran-Tirkiye her gavê bi hev re plan kirine. Mînaka herî dawiyê ew e ku di referandûma serbixwe ya Başur de Îran û Tirkiyeyê bi hev re bi darê zorê di nav rojekî de ji sedî 52 axa kurdan ji destê kurdan derxistin.

Xaleke din ku Lavrov ji ber wê zikêşiyê dijî û vê tîne ziman jî ev e: "Li bakurê Suriyeyê çavkaniyên petrolê hene, ev dewlemendî di destê kurdan de ne. Me got di navbera xwe û Sûriyeyê de pirekî çêkin, lê wan a me guhdar nekir, pala xwe dan Amerîkayê û gotin em ê dewletekî çêkin."Lê ev gotin û şîrove buxtan in. Rêxistinên kurdan tu carî negotine em ê bi Amerîka re dewleteke kurdan ava bikin. Berovajî vê hemû civînên Lavrov jî û nûnerên welatên wê di nav de, nûnerên kurdan bi dehan caran xwestine bi rejîma Sûriyeyê re li ser bingeha destûreke demokratîk, pergaleke nenavendî (federasyon, xweserî) li hev bikin, ev yek pêşniyaz kirine, plan û projeyên demokratîk bi pêş xistine. Herwiha destûra ku Dewketa Rûsyayê amede kiribû, di 2018an de bi giranî ji aliyê rêvebirên kurd ve hatibû pejirandin jî. Lê rejîma Esad qebûl nekir, a qebûlkirî jî salane 200-300 hezarê hemwelatiyên wan nîn e. Ya rast her tiştê kurdan ji destê wan hatiye standin, war û malên wan bi navê kembera ereban dane ereban, ji deştê anîne bi cîh kirine. Anku bi vî mafê jî wek tiberik didan.



Rûsya dê di israrkirina şaşitiya Sûriyeyê de winda bike, êdî nikaribe kesekî ku tawanbar bike jî bibîne. Ji ber ku wê demê êdî kurd dê bibin faktorên esasî. Ya giring, Lavrov û siyaseta Rûsyayê divê dev ji şaşitiya ku kurdan wek amûr digirin dest berdin. Rê û rêbazên hevkariyên stratejîk bi pêş bixin, ji ber ku kurd cînarên wan in

Mijara çavkaniyên petrolê mijareke girîng e. Ev petrol ji axa kurdan dertê. Ruxmê vê jî rêvebiriya kurd bi dehan caran got ku "Fermo; em destûreke bingehîn a demokratîk çêkin, dewlemendiya sererd û binerd bi rêbazeke adilane parve bikin." Lê Lavrov û rejîma Suriyeyê jî got: "Na, hûn ê giştî bidin me, em paşê ser mijarên siyasî guftugoh bikin."

Welatê Lavrov pêşneyaziya modela Çeçensitanê li rejîma Suriyeyê kir, lê wan qebûl nekir. Herwiha modela Tanzanya jî pêşneyaz kirin dîsa qebûl nekirin. Lê Lavrov dîsa jî bêşerm kurdan tawanbar dike.

Lavrov di beşa çareseriyê de jî got: "Em, Îran, Tirkiye û Çîn di nava vê pêvajoyê da cih bigirin da ku pêşeroja Sûriyeyê diyar bikin." Ev pêşniyaz tenê tê wetaya ku tu carî dê destûr nedin ku kurd mafên xwe yên mirovî û hebûna xwe ya neteweyî bi dest bixin. Ev hişmendî ev nêzîkî 150 sal in mijara kurd wek amurekê digire dest. Armanca Îran û Tirkiyeyê jî bi awayekî tunekirina kurdan e. Çîn jî tu carî li ser mijara kurdan xwedî tu proje nîn e. Herwiha ji bo tu netewan nîn e, tenê berjewendiyên aborî esas digire.

Derencam; Lavrov kiryarên xwe yên li Rojhilata Navîn winda kir. Li qurbaniyan digere ku li gor xwe Tirkiyeyê dilxweş bike. Ji bo vê jî kurdan tawanbar dike, da ku demeke din di şerê li Ukranya de di bazara rêş de alîkar bin. Lê nizane ku êdî bêhna tirkan çikiyaye, NATO û hevalbendê wê li ser pêxiriya tirkan rûniştine. Rista Tirkiyeyê ya dema şerê sar êdî pir lewaz e. Îran qeyrana sosyolojîk, aborî, bîrdozî dijî, kefenê mirinê lê hatiye pêçandin. Anku tu dê nikaribin tu sûdê bidin Lavrov û welatê wî. Rûsya dê di israrkirina şaşitiya Sûriyeyê de winda bike, êdî nikaribe kesekî ku tawanbar bike jî bibîne. Ji ber ku wê demê êdî kurd dê bibin faktorên esasî. Ya giring ew e ku divê Lavrov û siyaseta Rûsyayê dev ji şaşitiya ku kurdan wek amûr digirin dest berdin. Rê û rêbazên hevkariyên stratejîk bi pêş bixin, ji ber ku kurd cînarên wan in.

# Dada dijminahiyê

Dr. Rodî Zinar

Dad û tenduristî du têgehên ku hevdu temam dikin in. Lê dema ku têgeheke din derdikeve holê û xwe daxilî nava herdu têgehan dike rengê dîtbariyê tê guhertin û dîtbari di nava şert û mercên taybet de xwe dike esmanekî cuda. Dad mîna hevsengiyê, aliyekî wê heqîqet û aliyekê wê jî exlaq e. Tenduristî jî xwedî hevsengiyeke ku ji çend xalan pêk tê û heman xal mîna honandinekê pêdivîtiya jîndariyê ne.

Dijminahî di xwezaya mirovan de tune ye. Piştre daxilê jiyana mirovan bûye. Hema daxilîbûn di pey re bûye mîna rêbazeke hêzê û bi karanîna hêzê jî dijwarî û zalimî bi xwe re aniye. Ev wêneyê dijminahiyê jî, ku kesên dijminên hevdu ne di xwe de maf dibînin ku her pêkanînê, bi her rengî, bi dijberê xwe bikin û vê pêkanînê jî ji xwe re maf dibînin. Çi bi dijberên wî tê ne xema kiryardar e, zalimî serdest dibe.

Ji ber ku di zalimiyê de exlaq, empati yan jî tevger û ramanên li ser parastin û liberçavgirtina kesên li hember nîn e. Ji bo ku dijber têk biçe her kiryar, bêexlaqiyê û hemû rêbazên êrîşê ji xwe re maf dibîne û di kiryarên xwe de; xalekê tenê difikire ku ew jî bi serketin e û ji bo serketinê her rêbazê ji xwe re maf dibîne.

Lê çi dibe bila be; mirovahiyê bi tecrubeyên ku ji mirovahiyê re bûne zêdek, mîna erênîkirineke hevpar kirine mijarên ku divê her kes lê baldar bin, heman baldarî ji xwe re kirine nirxên ku divê di jiyana mirovan de serdest bin, heman baldarî kirine rêzikname yan jî kirine qanûn û urf û adetên ku di nava têkilî û jiyana rojane de mîna serîlêdanên alîkar tên bikaranîn. Mîna parastina civaka sivîl, mîna di şer de jî divê, xweza, zarok, kal, pîr, jin û binesaziyên civakê bên parastin û tevgerên li dijî heman cureyan; mîna sûcê dij mirovahiyê tên nirxandin.



Divê mirov hinek pirsan bipirse ku kesên cîranê hevdu, kesên ji dînê hevdu, kesên di talî û tirşiyê de ji hevdu re bûne alîkar! Rojek berê; dost, xwişk û bira, lê rojek derbas dibe, dibin dijminê hevdu û hevdu talan dikin, dişelînin. Hevdu qir dikin û naxwazin ku dijber mafên xwe yên mirovahiyê bijîn. Lê ku heman bûyer were serê kesên ku îro hêzdar in û di qelsiya sibehê de heman rehmê, heman nêzîkbûnên mirovahiyê ji xwe re dixwazin. Ev durûtî ye. Lê bes dad û tenduristî durûtiyê ranagire û divê mirov û mirovahî ji vê durûtiyê dûr bisekine yan jî vê durûtiyê biterikîne.

Di salên 1970-1980yan de qaşo çepgir û rastgiran bi hevdu re şer dikirin û ji hevdu mirov dikuştin, bêhtir çepgir bi alîkariya saziyên dewlet û mafyayê dihatin kuştin. Lê di encamê de derbe çêbû, Kenan Evren ê faşist bû desthilatdar û di roja derbeyê de tevahiya bûyer û tevlihevî mîna benê bi kêrê hatî jêkirin qut bûn, êdî bûyer qediyabûn. Derket holê ku derbekaran heman çalakî li ser navê dijberan bi kar anine û bi rengekî dualî ew berî hevdu dane. Îro heman alî di refekê de dibin yek û di nijadperestiya li dij kurdan de çi ji destên wan tê dikin. Benîştê devê wan dibêjin pirsgirêka kurd lê tu pirsgirêka kurd nîn e! Pirsgirêka ku li serê kurdan bûye bela heye û ew jî ji bo kurdan tune bike, ji aliyê Dewleta Tirk û aligirên wê ve; di mertaliyê de, di taldeyê de, di fen û fûtan de, li pitş perdeyê mandelebûn a kurdan e. Ji bo ku heman xwestek û armanca xwe pêk bînin; ji tu rêbazan bi şûnde namînin. Lîstik, xapandin û tevahî rêbaz.

Ji yên ku diketin tora heman xapandinê re dibêjim ku gelo kîjan xwestek û armanca we ji mirov û kesan hêjatir bû ku we ciwan û kesên aqilmend dikuştin? Ew tiştên ku we wê rojê diparastin gelo heman hincetên we bi ku derê ve çûn ku îro li ber pirsgirêka ku we li serê kurdan kiriye bela, hûn bûne yek? Divê bê zanîn ku ji bo tendurşstî û dadeke yekhev an jî hevsengiya di jiyanê de rast bê jiyîn, divê vîneke azad hebe ku beyî tevlihevî û bêyî lîstokan jiyaneke aram pêkan bibe.

Seyid Evdilqadir kurê Şêx Ubeydulah (ku ew bi xwe serokê serhildanê ye) di heman demê de serokê dewleta Osmanî şûra ye, endamê Meclisî Mebusan û serokê Komeleya Parastina Kurd e! Mustafa Kemal wî dixapîne û dibêje "Têlê bişîne ji Lozanê re û bibêje ku me mafê xwe girtiye." Wê demê Şerîf Paşa û Nubar Paşa li konferansa Parîsê li ser nexşeya Kurdistan û Ermenistanê li hevdu kirîbûn. Piştî ku di Lozanê de navê kurd û Kurdistanê winda bû û pê ve; serhildana Şêx Seîd kirin hincet û Şêx Evdilqadir û kurê wî girtin anîn li hember mizgefta mezin ku dîndar jê re dibêjin Haremî Şerîf a Pêncemin, berê kurê wî li pêş çavên wî daliqandin û di pey re ew daliqandin. Ji ber ku dadeke neheq û bêwijdan e dixwazin ku pêşiyê derdê kezebê bibîne û pey re wî darve bikin. Çiqasî li ber rayedaran digere ku dibêje "Ez serokê Dewletî Osmanî Şûra û nizanim çi me, lê tu kesan gotinên wî li ber çavan negirtibû. Ji ber ku kar û peywira ku wî hilgirtibû ser milên xwe pêk anîbû û karê dewletê bi wî qediyabû.

Tenduristî tiştekî ber bi çav e û di durûtiyê de sererast nayê jiyîn. Mêzîna dadê berbiçav e û ew jî di durûtiyê de sererast nayê jiyîn, ji ber ku encama biryarên dadê jî berbiçav in û bandorê li jiyana rojane dike.

# Dewleta tirke: Çala tarî

Hukmatê AKPyî hetêk ra kurdan reyde pêvînayîşan keno, hetekê bînî ra polîtîkaya tedaker û qirkere ra fek vera nêdano. Hem sîvîlî yenê qetilkerdene hem zî rojnamegerî tepişîyenê

Merkezê Xeberan



Bîpolarîya dewleta tirke bê mabên domîyena. Senî ke merdimêk bîpolar o, karakterê ci her roje û her dem bedilîyeno, karakterê dewleta tirke zî "qurfbar" o. Na dewlete bi taybetî vera kurdan manîk û depresîf a. Çike çîyêko ke kurdî talep kenê, metabolîzmaya netewe-dewlete xeripneno. Çike kurdî vanê ke wa nê welatî de hemwelatîya têduşte bibo û serdestîya yew netewe nêbo. Çike kurdî vanê ke ziwanê înan sey fermî bêro qebûlkerdene û no heq bi hawayêko huqûqî bêro şinasnayene. Çike kurdî vera nîjadperestîye veng vejenê û planané nîjadperestan xeripnenê.

Bîpolarîye baxusus nê rojanê krîtîkan de zî yena çimdarîkerdene. Xora karakterêko sihetin nê rojan zelal beno. Nika dewleta tirke de esasî îdarekarîya di merdiman xeylê eşkera ya. Yew "hakan" o, o bîn zî "aygucî" yo. Wina aseno ke hakan û aygucî mîyanê xo de karbeşîye kerda û goreyê stratejîyêkî wezîfeyê xo anê ca. Hakan ziwanê bînî, aygucî ziwanê bînî şuxilneno. Hakan vano ke "ma do qir bikerê, bikişê, çin bikerê û terorîstan wedarnê", aygucî vano ke "ma aştî wazenê, wa proses dewam bikero, komel aramîye wazeno". No taktîk o. Senî ke yew merdim tepişîyeno û zîndan de bi destê tayê polîsan îşkence vîneno, o bîn zî yeno û qaso ke tepişteyî rê "werê gêreno". Reftaro ke tepişte raştê ci yeno, ewro kurdî zî raştê ci yenê. No reftar reftarêko binkor o.

**Qetilkerdişê Bavê Teyarî**

Aygucî eşkera keno ke "pêvînayîşî qîymetin ê, wa gamê şênberî bierzîyê". Hakan ferman dano pêro hêzanê asayîşî ke hemverê kurdan şîdet bişuxilnê. Hem Bakûrê Kurdîstanî hem zî Rojawan de cergê hakanî gonî rişnenê. Çend hewteyî yo ke awbendê Tişrînî de sîvîlî bi destê teyaranê tirkan yenê qetilkerdene. Cergê ke dewleta tirke ra hetkarîye gênê, dewe û bajaranê Rojawanî de hêrişanê qilêrinan serûber kenê. Tewr peyên hêrişan de kaykerê tîyatroyî Bavê Teyar zî ame qetilkerdene. Bavê Teyar nameyê ey o bîn Cuma Xelîl Îbrahîmî hema hema 30 serrî Rojawan de xebatê tîyatroyî kerdî. Cayê ey zerrîya kurdan de xeylê berz ê. Çi heyf ke bi destê cerganê tirkan ame qetilkerdene. Dewleta tirke têna Bavê Teyar nêkişt, heman wext huner û tîyatro zî kişt. Heramîye genanê na dewlete de est a. Senî ke Sokrates nuseno "Dewletê ke tede huner û kultur rijîyaye yê, kelayî berz ê, dewletê bedbaht ê". Dewleta tirke zî têna kelayanê xo berz kena, nameyê kultur û hunerî çi ke est o rijnena. Bavê Teyar hetê nê aqlê kovî ra ame qetilkerdene.

**Malikê korî**

Cergê "hakanî" Bakûrê Kurdîstanî de zî polîtîkaya tedakere anê ca. Kedkarê çapemenîya azade her hewte raştê zulm û zextan yenê. Tewr peyên rojnamegerî Reyhan Hacioglu, Necla Demîr, Rahîme Karvar, Ahmet Guneş, Vedat Oruç û Welat Ekîn tepişîyayî. Sey her wext înan rê sucê "endambîyayîşê rêxistina terorî" erzîya. Teror, terorîstan, terorîzm ra ber tu çekuye nêzanê. Rojnamegerî seba ke raştîye nusenê, raştê her tewr cîyakerî yenê. Hakan û aygucî hem vanê ke aştîya komelkî bêro awankerdene, hem zî binê prosesê aştîye rê dînamît erzenê. Tepiştişê rojnamegeran astengîya aştîya komelkî ya. Dewletê ke xo sucdar hîs kenê, kenê ke rojnamegeran bigêrê binê bandora xo. Estbîyayîşê her kedkarê çapemenîya azade yeno manaya roşnkerdişê tarîyan. Tarîya ke hakan û aygucî awan kenê de her xirabîye est a. "Defter-î amelîyê" înan de bertîl, dizdîye, bêrayîrîye, bêedaletîye, şer ûsn qet kêmî nêbenê. Ê na tarîye de sey "malikanê koran" yew bînî pawenê û ciwîyenê.

---

Çengeyê Edebîyatî



## Çeqel

Dewrêş Baba

Hênî zerê mi de şewerîya
Mi va: "Şorî wertê qomê ma yê
Almanîya."
Mi sarê xo guret, çê xo ra vejîya
Şîya nêşîya, şansê mi nêşuxilîya
Raştê polosê çeqelî bîya
Derdê to çeqelî Çeqel, Çeqel, Çeqel!
Kula to çeqelî Çeqel!
***
Alî Askerî va: "Dewuzê to çiqa ro?"
Mi va: "Ponsê marqê gawiran o."
Va: "Dewuzê to şenik o, tersen ke to
yaçarno."
Însanlik namina ponsê marq da mi, va
nêbo perîşan o
Mi çi zana, ponsê marq, çeqelî rê
beno tîkano
Çeqel, mi qaçaxcî zano
Derdê to çeqelî Çeqel, Çeqel, Çeqel!
Kula to çeqelî Çeqel!
***
Çeqelî pasportî guretî, araştirmiş kerdî
Mi ra tayê çîyî pers kerdî
Mi zon nêzana, ti bê dîyarê min o nê
derdî
Mi bêçikê xo Çeqelî rê ardî, berdî
Ci rê bi bêçikan tarîf kerdî
Derdê to çeqelî Çeqel, Çeqel, Çeqel!
Kula to çeqelî Çeqel!



***
Çeqelî, perê mi guretî, kerdî sayî
Mi de perê zêde vecîyayî
Sarê xo hejna, çimê xo yê jengî ta dayî
Soxukdamgasîye kerde xo dest
Mi îda kerde, leyrê kutikî va: "Nayîn
nayîn!"
Mi dawa Çeqelî da Îsayê rohelayî
Belkî Çeqelî bikero raştê belayî
Derdê to çeqelî Çeqel, Çeqel, Çeqel!
Kula to çeqelî Çeqel!
***
Ti teze bê dîyarê mi no nê derda
Çeqelî ez eşta nezaret, heşt-new saatî
têde verda
Leyrê kutikî, ju cixarê cebê mi de
nêverda
Derdê to çeqelî Çeqel, Çeqel, Çeqel!
Kula to çeqelî Çeqel!
***
Ti kamaxê nezaretî de menda îkîndîyê
şanî
Ti kamaxê nezaretî de bîhngirtî bîya
Teselîya mi kote, ninga ser ama, şîya
Hêbetan ra, araq de fatasîya
Vêşanîye ra bira bira zerê mi xewerîya
Bêçik nê ro zîl, mi qayt kerd
Juyo herîşhajhajik na wo çêber de
vecîya
Mi be dest îşaret kerd, va "Bi peranê
mi, tenê non mi rê bîya."
Leyrê kutikî lew verda ro, mûrizîya
Derdê to çeqelî Çeqel, Çeqel, Çeqel!
Kula to çeqelî Çeqel!
***
Ti kamaxê nezaretî de menda îkîndîyê
şanî
Olaya mi bîye zê olaya Welîyê Feqî
Silêmanî
Damawo Dewrêşo feqîro, pey de na
ro uçaxe
Ruşna Îstanbul Yeşîlkoy Hewaalanî ey
Çeqelî
Derdê to çeqelî Çeqel, Çeqel, Çeqel!
Kula to çeqelî Çeqel!
Naletî şoro ecdîyadê to çeqelî Çeqel!

*Çime:* Deyîrbaz û Şaîrê Gimgimî Dewrêş Baba (1938-1999), Amadekerdox: Alî Aydin Çîçek, Weşanxaneyê Vateyî, Stenbol, 2024, rr. 123-125.

---

# Gelo terorîst kam o?

Mihemed Kurdî

Xêylê rayî ma dîyê û ma bîyê şahid ke tirkê nîjadperestî vanê, heme kesê ke Tirkîya de ciwîyenê tirk ê û ziwanê înan zî tirkî yo. Ena ray gama ke şarê ma înan rê vanê, nê ma tirk nîyê, ma kurd ê û ziwanê ma zî tirkî nîyo, kurdî yo, mihal înan zî ma rê vanê şima terorîst ê û wazenê ke dewleta ma lete bikerê.

Seke yeno zanayîş dewleta Tirkîya roca ke awan bîya heta nika bi pergalê yewperestî yena îdarekerdiş.

Yanê naye dewlete (Tirkîya) binîata xwu yew ziwan, yew şar, yew welat û yew ala ser o awan kerdo. Eke seserre verê cû Tirkîya de yew persname/ anket biameyêne kerdêne û şarî rê bivatêne qewmê/nîjadê şima çî yê ? O çax do tewr vêşî sera ra panc bivatêne ma tirk ê û tewrî kem zî do sera hîrês û panc zî bivatêne ma kurd ê. La pergalê Tirkîya yewperest mîyanê seserre de kultur û ziwanê şaranê sey laz, ereb, çerkez, tatar, arnawût, boşnak... asîmîle kerdê. Ma eşkenê bivajê ke kurdan ra vêşêr heme şaranê binê ke Tirkîya de ciwîyenê vera polîtîkayanê asîmîlasyonî de têk şîyê û tirk û tirkitî qebûl kerdê. Ê şarê ke ziwan û naznameyê xwu yê bingeyî eşt ê û asîmîle bîyê roca ma yê ewroyîne de tirkan ra vêşêr nîjadperestîya tirkan kenê. Coka eke Tirkîya de ewro yew persname bêro kerdiş sera heştay ra vêşêrî şarî do bivajê ma tirk ê. Yanê naye dewlete bi pergalê xwu yê nîjadperestîye xwu rê yew şarê newe û bê binge viraştê. Enê şarê arêdayê (devşirme) zî xwu sey wayirê ney welatî vînenê û gama ke yew vano ma tirk nîyê, hema ca de vanê "yan şima do bivajê ma tirk ê, yan zî şima do no welatî terk bikerê", bi taybetî zî vera ma kurdan de wina vanê.


Çimkî ma kurdan sey înan asîmîle nêbîyî, ma vera pergalê yewperestî de xover da û ma bi qandê hêza xwu hertim û her ca de vera polîtîkayanê înkar û asîmîlasyonî de dewaya heq û ziwanê xwu kerde. Enê cehd û xoverdayîşê şarê kurdî yê vera dagirkerdoxan de tirkanê nîjadperestan har keno. Coka gama ke ma yew ca de bi ziwanê xwu (kurdî) qisey kenê, înan ma rê vanê, "ziwanê dewleta ma tirkî yo, seba ke ma yewbînan fam bikerê, ganî şima zî sey ma bi tirkî qisey bikerê, şima zî do sey ma bi tirkî qise bikerê."

Reyna vanê, "Tirkîya de tenya kurd çin o, sewbînan şarî zî est ê, eke dewlete ziwanê kurdan fermî qebûl bikero, o çax şarê binî zî do dewaya ziwanê xwu bikerê. Coka nêbeno ke dewlete de yewî ra vêşêr ziwanê fermî bibo, çimkî eke dewlete ziwanê heme şaran nas bikero do mîyanê şarî de bêtifaqî bivirazê û peynî de dewlete do lete bibo."

Helbet heqê şaranê bînan zî est ê ke dewaya ziwanê xwu bikerê, çimkî ziwan heqêko xozayî yo. La mi heta nika nêdîyo ke kurdan ra vêşêr sewbînan şaran dewaya ziwan û heqanê xwu yê bingeyînan kerdê û yan zî seba ke ê heqan bidest bifînê yew xebate kerdê, seke mi jor de zî vat, ê tirkan ra vêşêr tirkî yê.

**Ferqê kurdan çi yo?**

Kurdan ra vêşêr zafaneyê şaranê bînanê ke nika Tirkîya de ciwîyenê teberî ra ameyê ney welatî, tirk zî mîyanê ê şaranê ke teberî ra ameyê de yê. La ma kurdî wayîrê ney welatî yê, ma tarîxê xo de îta de yê, verênan (baw û kalê) ra ma îta de yê, rîçê ma îta de yê. Ma seke şaranê bînan bi mêmandarî nêameyê ney welatî, ma wayîrê enê welatî yê, eno zî ferqê tewr pîl yê mîyanê ma kurdan û şaranê bînan de yo. Coka nêbeno ke kes ma kurdan û şaranê bînan bikerê yew, çimkî ma wayîr ê, înan mêman ê. Raşta mêmanê ma nika seba ke xwu bi pergalê yewperestî bidê heskerdişî hertim û her ca de bi vatişan: "Çi bextewar ê ke vanê ez tirk a" galeyê kurdan kenê la înan zî hol zanenê ke ney welat, welatê ma Kurdan o û nameyê ci zî Kurdîstan o.




**Şixulnayîşê çekuya terorîstî**

Verê cû Tirkîya de çekuya "terorîst" qada sîyasetî de zaf aktîf nêbîye la ena seranê peyênan de sîyasetmedarê Tirkîya zî nê qalê (terorîst) zaf şixulnenê, bi taybetî zî temsîlkarê hikumetî. Raşta ci "terorîst" hetê mana de çekûyêka zaf giran a la roca ma ya ewroyêne de, sîyasetmedarê Tirkîya sey ke xwu ra qurtêk awe bişimê ney çekuyê xerab vera ferd, grube û partîyan de şixulnenê. Bi rastî şixulnayîşê ena çekuye ziwanê sîyasetî zaf lêmin keno.

Serekê dewlete ra bigirê heta wezîr û wekîlê dewlete zî ena çekuye (terorîst) zaf rehet şixulnenê, bi taybetî vera ma kurdan. Gama ke temsilkarê kurdan, sîyasetê hikumetê yê kurdan ser o rexne kenê û dewaya heqê kurdan kenê, o çax ê hema ca de vanê, şima terorîst ê. Bi eno qaydeyê hem hetgiranê xwu yanê nîjadperestan vera kurdan de har kenê û hem zî heme gune û sucanê xwu niminê.

Bi kilmekî Tirkiya de krîterê terorîstîye wina yo: "kam ke xwu rê bivajo ma tirk ê û ziwanê ma zî tirkî yo, o çax benê hemwelatîyê ney welatî û kam beno wa bibo yê ke wina nêvajê zî benê xaîn û terorîst."

Raşta ci ma kurdan heta nika nasname û ziwanê kesî qedexe nêkerdo, ma kultur û hunerê kesî înkar nêkerdo, ma goristanê kesî bomba nêkerdo, ma welatê kesî dagir/îşxal nêkerdo, ena ray ez verpirsê persa "terorîst kam o" şima rê verdana.





# Tiştanok

Gelî hêjayan; mamik an jî tiştanok çandeke kevnar a gelê kurd e ku berê di civat û şevbêrkên xwe de ji hev dipirsîn. Me dîsa ji we re çend tiştanokên xweş amade kirine. Em hêvî dikin ku bi dilê we bin.

1-Mamê mino
Ez li zeviyan mîr bûm
serbilind û jîr bûm
bayê felekê li min da
li ber malê girêda
ev çi ye?

2- Mamê mino
ez vê sibê çûm îş
ecêbek hate pêş
şeşling bûn jexne lêş
De bêje ev çi ye



***Bersivên me ev in:***

***1-*** Melkes, gêzî, sifnik ***2-***kevjal

# Nalê hespan

**Hesen Hemkê**

Berê gelek tiştên me yên ecêb hebûn. Hinek ji wan biwate bûn û mirov dikaribû şîroveyekê li ser bike. Lê hinek tişt jî hebûn ku bêwate bûn û tu şîroveyeke nêzîkî aqil jê re tunebû.


Wekî mînak; berê dema ku me malên xwe bi kilsê spî dikirin dawiyê xetekî şîn jî li seranserê dîwarê hundirê malê xêz dikirin. Mezinên me digotin; "Ew ji bo nezerê baş e. Mirovên ku nezera wan hebin dema ku wê xeta şîn bibînin dê bandora enerjiya awirên wan kêm bibe û dê nikaribin malê çavînî bikin.

Adetekî din jî hebû ku nalekî hesin bi ser deriyê derve ve didaliqandin û digot ew siûdê bi xwe re tîne.

Bi hersê navê Xwedê ew qet neket serê min. Ma ku nalan şens anîba dê ji pepûka hespê re anîba. Çar nal di binê lingê hespê de ne û sibê heta êvarê siwar qamçiyan li stûyê wan didin .



# XAÇEPIRS




## JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ DE

3-Birêveçûn ***5-*** Cînavkek ***7-*** Koma pez ***8-***Daçekek ***9-*** Alava ku bar û piştî pê tê girêdan ***13-*** Rejîma berê ya Şamê ***14-*** Bazdan ***16-*** Ji niha şûn de ***19-*** Eşîrekî kurdan ***20-*** Ji bo ***21-*** Endamê sereke yê jiyana zindiyan ***22-*** Ajansekî kurdan ***25-*** Hewcedariya avê ***26-***Temaşevan ***28-*** Nasnavê şanogerekî kurd Bavê...

## JI JOR BER BI JÊR DE

***1-*** Serdestî
***2-***Tevlihevkirina ax û avê
***3-*** Sewaleke ku ji bo goşt û hiriyê tê xwedîkirin
***4-*** Dijberî aştî
***6-*** Heskirin, dildarî
***10-*** Rengek
***11-***Xelkê Swêdê
***12-***Koka gelê kurd
***15-*** Şêweyekî avahiyan
***17-*** Bawerî
***18-*** Binemaleke hindoewropî
***20-*** Sewaleke çolistanê
***23-***Dijberê cot
***24-*** Çala ava vexwarinê
***27-*** Noteyekî muzîkê

## Bersiva hefteya borî





Dildarê
Amedê

# De were safî bike

Di van rojên dawî de gelek bûyer qewimîn û nizanim ji ku dest pê bikim.

Kula herî giran û derdê li ser hemû derdan qetilkirina şanogerê kurd Cuma Bavê Teyar bû. Bi rastî xebera koçkirina wî wekî pizotekî êgir dilê bi milyonan kurdan şewitand. Herwiha vê xeberê bi qasî van 20 salên ku em bi hunera xwe kenandin, ewqasî em bi girî xistin. Gelek bîranînên me bi hev re hene, lê ez ê tenê behsa bîranînekê bikim.

Di sala 1997an an jî 1998 bû, em bi hev re di koma şanoyê de dixebitîn. Demeke kurt ji cejna Newrozê re mabû û koma şanoyê li gundekî Qamişloyê provayên xwe yên ji bo pîrozbahiya Newrozê dikir. Em nû gihabûn gund. Hinek gundî li me civiyan. Pîrejinekê berê xwe da Bavê Teyar û çû li kêleka wî rûnişt. Pîrejinê maçek li eniya Bavê Teyar da û jê re got: "Xwedê ji te razî be, henekên te gelek xweş in, ka hinekî ji me re meymûntiyê bike."

Bavê Teyar rabû ser xwe û got: "De were safî bike mamoste, pîrê navê huner û şanoya me dike meymûnî."

Herçendî ku wê pîrejinê ne bi niyeteke xirab wiha gotibû jî mixabin nêrîna piraniya xelkê me ji bo hunera qerf, henek û şanoyê bi vî rengî ye.

De bila gora Bavê Teyar bihuşta narîn be. Bawer im ku gelê me dê piştî koçkirina wî çavên xwe gelek lê bigerîne û qedrê wê hunerê bêtir zanibe.

Ji kenê te yê nîvcomayî
Ji dilê min ê matmayî
Ji kezeba Qamişloka birîndar
Xwîn rijiya
Xwîna te jî tevî lehiya xwînê ya çemê Firatê bû
Xwîna bi ax û toza Rojavayê dil vestirayî,
Te dizanibû ku ken li vî welatî qedexe ye
Dilxweşkirina kurdan
Qerf û henekên wan
Kêfxweşî û şahî li kurdan qedexe ye,
Te dizanîbû kîndar ji xwîna kurdan têr nabin
Lê tu bêyî xatirxwestin çûyî
Te li pey xwe ken û henekên xwe hiştin
Bîrdozî û biryardariya heta dawî
Û di çavên bi milyonan hezkiriyên xwe de
Tu bûyî rondika asê ya di çavên evîndar de

***

Mijareke din a balkêş û ji derveyî asayîbûnê parvekirinekî li ser medya dijîtal bû.

Wezîrê karê derve yê HTŞê Asad Hesen El Şîbanî li ser hesaba xwe ya medyaya dijîtal peyameke bi zimanê kurdî nivisandiyê. Peyam bi kurdiyeke bêşaştî hatiye nivisandin.

Peyam wiha ye: "Kurd li Sûriyeyê bedewî û ronahiyê li cihêrengiya gelê Sûriyeyê zêde dikin. Civaka kurd li Sûriyeyê ji aliyê rejîma Esed ve rastî neheqiyê hat. Em ê bi hev re welatekî ava bikin ku her kes tê de wekhevî û edaletê hîs bike."

Belê peyam ev e û bi çi armanc û rasteqîniyê hatibe nivisandin ez nizanim lê sedemên balkêşiya vê peyamê hene.

Di rastiya xwe de ew tiştekî gelekî asayî û normal e ku li welatekî ewqas kurd bijîn bi zimanê wan xîtabî wan bê kirin.

Lê ji ber ku pergalên dîktaror û yekperest ên desthilatdarên ku welatê kurdan di nava xwe de parve kirine û siyaseta wan a qirêj li dijî kurdan û zimanê kurdî ye ev tiştê asayî wekî tiştekî derasayî û nejirêzê tê xuyakirin.

Ma çawa em ê vê yekê asayî bibinin, li erdnîgariyekê ku ji bo zimanê kurdî bi dehan nivîskar û rojnameger hatine kuştin, bi hezaran kes hatine zindankirin.

# Şewata Vartînîsê bû belgefîlm!

Piştî 30 salan doza Vartînîsê bê encam betal dibe di rûpêlên dîrokê de. Heyanî niha di vê warî gelek nûçe, bername û rapor hatin amadekirin. Lê cara yekemîn derbarê wê de belgefîmek hat çêkirin. Belgefîlma Vartînîsê bi dimenên arşîv û hevpeyvînan pêk tê

Alî Guler



Çend meh berê belgefîlmek derheqê şewata sala 1993an a bi mirina 9 kesî hatibû pêkanîn bi navê 'Vartînîs' hat çêkirin û nîşandan.

Di belgefîlmê de şahîdê bûyeran û hiqûqnas behsa şewata mala M. Nasir Ogut, helwesta artêşa tirk a li dijî kurdan û nêzîkbûna rayadarên dewletê tê kirin.

Vartînîs gundêkî girêdayî Têlî ya bajarê Muşê ye. Gund, di 3yê cotmeha sala 1993yan ji aliyê artêşa tirk ve hat şewitandin. Di encama vê şêwatê de ji heman malbatê 9 kesan jiyana xwe ji dest dan.

Li ser vê şewata Vartînîsê 32 sal derbas bû. Heya niha di vê mijarê de gelek nûçe, bername û rapor hatin amadekirin.

Lê cara yekemîn belgefîlmek bi vî awayî hat çêkirin. Derhêneriya belgefîlma Vartînîsê jî ji aliyê Omer Biçer ve hatiye kirin. Belgefîlm bi giştî 56 deqîqe ne û ji hevpeyvîn, dîmenên gundê Vartînîsê, arşîvên berê yê ji dozê û ji kirinên artêşa tirk ên li heremê pêk tê.

Di belgefîlmê de parlamenterê Partiya Demê ê Muşê Sirri Sakik, parêzer Eren Keskîn, şaredarê wê demê yê Vartînîsê Bakî Duygu jî di nav de jî gelek gundî, xizm û şahîdên bûyerê diaxivin û behsa wan rojan dikin. A herî girîng jî hest û lêgerîna edaletê ya endama malbatê ya ku sax filitîbû Eyşe Ogut e.

Di belgefîlmê de tenê behsa bûyerê nayê kirin, di heman demê de pêvajoya dozê, helwesta dozger û dadgehan jî bi awayekî zelal tê nîşandan.

Em di rojên gelek girîng û germ de derbas dibin. Ji bo çaresariya pirsgirêka kurd nîqaş, gengeşe û hevdîtin tên kirin. Di raya giştî de hêvî û bendewariyeke mezin heye. Lê ji aliyê din ve jî pirsên bêbersiv jî di hişê mirovan de zindî ne. Gelo ev pêvajo dê çawa berdewam bike? Dewleta Tirk dê ji kurdan lêborîne bixwaze yan na? Ji ber ku heya niha li dijî kurdan sucên pir giran pêk hatin. Gund hatin şewitandin, bi hezaran kesên bêguneh hatin qetilkirin û girtin. Dîsa bi milyonan mirov ji cîh û warên xwe hatin mişextkirin. Ev bi giştî bilançoya salên 1990î ne.

Gelo di vî warî edalet dê pêk bê? Ew kesên ku bi navê dewletê ev sûc pêk anîn dê bên darizandin? Tam di vê derê de belgefîlmê 'Vartînîs'ê bi awayekî zelal behsa şewatandina gundan û vê pêvajoyê dike.

Belgefîlm bi dîmenên bermahiyên ji mala M. Nasir Ogut mane dest pê dike. Wênêyên berê yên zarok û malbatê, qûşxane, tebaq û kevçiyan… 9 endamê malbatê li avahiyê jiyana dest dabûn, tenê çend tişt di dawiyê de mane. Niha ev xanî wek muzeyê tê parastin.

Bi van dîmen û muzîkeke xemgîn mirovan hildide bin bandora xwe. Di berdewamiyê de şahîd û niştecihên gund behsa şewatê dikin.

Hinceta şewata gund, ji neçarbûna serleşkerê Albay Bulent Karaoglu, a li ber gerîlayên PKKê tê. Ji xwe rojekê berê wê di pevçûnekê de leşkerek tê kuştin. Albay Karaglu jî dibêje; "Ez ê vî gundî bişewitînim"

Roja din di nivê şevê de gundê Vartînîsê ji aliyê leşkeran ve tê şewitandin. Di encama şewitandinê de M.Nasir Ogut, Eşref Oran, Sevda Ogut, Sevîm Ogut, Mehmet Şakir Ogut, Mehmet Şîrîn Ogut, Aycan Ogut, Cihan Ogut ve Cinal Ogut bi giştî 9 kesên ji heman malbatê jiyana xwe ji dest didin. Ji wê rojê şûnve jiyana gundiyan tê guhertin. Ev 32 sal in êş, xemgînî serwer e li ser gundiyan.

Jixwe ev gotinên xizmê Nasir Remzi Ogut jî balkeş in: "Em diçûn nava daristanan, ber avan. Em gelek kêfxweş bûn. Me ji xwe re gok dileyist. Lê piştî şewatê li gund êdî top nehat listin. Me dev ji listika topê berda."

Dîsa ji bilî dema bûyerê di dema pêvajoya dozê de jî di belgefîlmê de tê destirtin.?????? Eren Keskîn û parêzerên dozê jî helwesta dewletê li a derbarê Vartînîsê tînin zimên. Derhêner di belgefilmî de cîhekî berfireh ji dimenên arşîvê û dozê re veqetandiye. Albay Bulent Karaoglu di dîmenan de gelek rihet e û henekên xwe bi parêzer û gundiyan dike. Ev yek dibe mijara niqaşê jî.

Piştî 30 salan doza Vartînîsê bê encam dikeve rûpêlên dîrokê.

Belgefîlma Vartînîsê bi dimenên arşîv û hevpeyvînan pêk tê.

Berhemeke lêkolînerî û agahiyê ye. Bi her awayê bûyer û agahiyên veşartî bi rêya sînemayê tîne ser perdeya spî û nîşanî me dide.

Di warê kamera û pevxistinê de jî xebateke gelek serketî ye. Di vê demê de bûyerên wek Vartînîs û yên din li Kurdistanê divê zêdetir bi rêya belgefîlman bên nîşandan.

Fîlm li Amedê hat nîşandan. Demên pêş jî dê li Almanya, Hollanda û gelek welatan bi nîşandanên taybet bê temaşekirin.

---

## Aforîzma

### Winston Churchill

**Carinan mirov li rastiyê diqelizin û pê dikevin lê piraniya wan radibin ser xwe û bi lez meşa xwe didomînin mîna ku qet tiştek neqewimîbe.**

**Kembaxtirîn belaya hatî serê gelê Rusyayê welidîna Lenîn bû û belaya duyemîn kembax mirina wî.**

## Gotinên pêşiyan

**Dil li dil e, tune derd û kul e.**

**Dijminê biaqil ji dostê bêaqil çêtir e.**

**Her kesek bi qasî qeweta xwe.**

# Talankirina berhem û hunerên Kurdistanê

Nezîr Ocek

Bêguman talankerên Kurdistanê bi tenê xwe li talankirinê ranegirtine, wan di heman demê de gewher, kanzayên ser erdî û bin erdî û hemû hunerên ji aliyê zanyarên kurdan ve hatine dahênandin jî yan wêran kirine yan jî talan kirine. Wan dagirker û talankeran an bi dek û lêban an jî bi darê zorê dest danîne ser berhemên kurdan, lê xwedî derketine û kirine malê xwe. Mînakeke şênber a vê karaset û talankirinê li Cizîra Botan rû daye. Rûdana vê bûyerê ku dibe cihê xemgîniyê bi kurtayî wiha ye:

Wekî ku dîrok jî dide çespandin, gelê kurd gelekî dahêner û afirîner bûye. Ji kurdên sumerî bigire heta niha ku wan gelek berhemên mîna nivîs, salname, amûrên hilberînê û kedîkirina ajalan hilberandin, çêkirin xistine bin xizmeta gelê xwe û gelên din. Bi taybetî Cizîra Botan ku herêmeke erdnîgariya vî gelî ye, gelek kesên navdar û dahêner ji vê herêmê derketine berhemên nemir afirandine û xistine xizmeta mirov û mirovahiyê. Lê talankeran her tim berhemên wan an talan kirine yan jî wêran kirine.

Bo nimûne Deriyê Mizgefta Mezin a Cizîra Botan, ku ji hêla huner û nirxî ve li cîhanê wekî deriyekî dîrokî yê duyemîn hatiye çespandin, ku ev derî bi nîgar, dirûv, nimûş û nivîsên li ser hatine xemilandin di sala 1170î de ji hêla danerê kurd ê dameznerê forma sîbernetîkê Îsamyîlê Cizîrî ve hatiye çêkirin yek ji wan berheman e. Ev derî bi bronzî hatiye rûkêşkirin û nivîsa li ser ji kanza tûncî ye. Rûyê wî jî bi nîgarên ji sifir û zîvî hatiye xemilandin.

Ev derî xwedî du bask e, di nîveka herdu baskên wî de doqekên ji tûncî ku ji du marên ejderha, serê şêrekî û du teyrên baz ên ku asûna (pozisyon) hevdu temam dikin pêk hatiye. Li Cizîrê, ji van doqikan re 'Ejderhayên Cizîrê' tê gotin. Îsmayîlê Cizîrî wêneyê van ejderhayan di rûpelê 225mîn a pirtûka xwe de xêz kiriye. Bilindahiya vî derî 3 metre ye. Firehiya her baskî 1.13 metre ye. Cizîrî ev derî di serdema zengiyan de çêkiriye.

Li ser deriyê Mizgefta Mezin a Cizîrê nivîseke ku ji aliyê Îsmayîlê Cizîrî ve bi zimanê erebî ku ji kanza sifir û tûncî ye bi tîpên kûfeyî hatiye nivîsîn heye. Lê mixabin deriyê Mizgefta Mezin ê ku rûyê wî bi sifirî, bi nîgarên mar û ejderhayî hatibû xemilandin, ji ber ku pîşta wî ji depan bû riziye. Lê ev derî di sala 1946an de ji nû ve ji aliyê xeratê Cizîrî yê bi navê Îsmayîlê Nûrî ve bi hunera xwe ya xeratiyê hatiye restorekirin. Herwiha ev derî ji aliyê hinek kesên Cizîrî ve ji nû ve hemû taybetmendiyên wî yên mîna nîgar, dirûv, ejderha, mar, doqik û nivîsên ku berê li ser hebûne dîsa li gor reseniya wî hatiye nûjenkirin.

Îcar di sala 1983an de ji bo ku Mîmartî û Hunerên Destan ên selçûkiyan li Seraya Deriyê Topê ya Stenbolê di pêşangehê de bên nişandan, ku dê ev pêşangeh li Muzexaneya Şaristaniya Anatoliyayê ya Stenbolê bihata vekirin, herdu baskên deriyê Mizgefta Mezin a Cizîra Botan jî li gorî nivîsa fermî ya ku hejmara wê 395/143an ji Gerînendetiya Muzexaneya Mêrdînê tên xwestin. Miftîtiya Cizîrê jî, di roja 10. 06. 1982yan de ev derî ji bo demeke berdemkî ku li pêşangeha Stenbolê bê nişandan radestê Muzerxaneya Stenbolê dike. Piştî ku pêşangeh biqediya dîsa dê derî di sala 1984an de radestê Miftîtiya Cizîrê bihata kirin. Lê ji ber ku Deriyê Mizgefta Mezin a Cizîrê li cîhanê xwedî nirxekî antîk û xwedî hunereke bêhempa bû, talankeran mîna her tiştên kurdan ên din dest danîne ser derî, êdî ew venegerandine Cizîra ku cih û warê wî bû. Ew jî mîna berhemên kurdan ên din di Muzexaneya Stenbolê de hiştine, bi vê lêb û îxanetê dest danîne ser deriyê mizgefta qedîm.

Serokê Enstîtuya Enerjiya Nuklerî yê Zanîngeha Teknîkê ya Stenbolê, Prof. Dr. Beril Tugrul xebateke du salan li ser deriyê ku ji aliyê Îsmayîlê Cizîrî ve hatiye çêkirin dike û di encama vê xebata xwe de pirtûkûkê dinivîse, girîngiya vî deriyê bêhempa hem li Tirkiyayê hem jî li cîhanê belav dike.

Geştyarên Almanî yên ku dihatin Cizîra Botan, wêneyê Deriyê Mizgefta Mezin a Cizîra Botan dikişinin, ew jî li ber nimûşê van ejderhayan di teşeya wan de du ejderhayan çêdikin. Ev ejderhayên ku ji aliyê wan ve tên çêkirin li Muzexaneya Dewletê ya Alman bi hejmara 1/2242an tên tomarkirin. Li gor angaştekê, ev ejderha li ber berhema Îsmayîlê Cizîrî ya li Pirtûkxaneya Deriyê Topê hatine peçkirin (kopyakirin). Herwiha tê angaştkirin ku rûpela 26mîn a pirtûka Cizîrî jî ji vê pirtûkxaneyê hatiye dizîn. Her çi be bila bibe wan li nimûşê ejderhayên Cizîrî nihêrîne, paşê ew ejderha li ber nimûşê wan çêkirine, lê wan bi tu awayî nekarîne ejderhayên tam mîna yên Cizîrî çêbikin. Ejderhayên wan hem stûr, bêteşe û hem jî fîgurên wan jî tam ne mîna wî yên resen in. Lewre fîgurên ejderhayên Cîzîrî pir tenik û pir narîn in û rewatina wan bi hunereke hosteyane hatine şayesandin.



Îcar dema ku serokê Zanîngeha Prînceton û serokê Kursiya Mustefa Kemal Tirkologê navdar ê Amerîkî Bernard Lewîs ji Serokomarê Tirkiyeyê xelatê werdigire, ew 10.000 dolarî bexşê Muzexaneya Berheman a Stenbolê ya Tirk-Îsalmê dike. Sedema bexşandinê ew bû ku wan Deriyê Mizgefta Mezin a Cizîra Botan di pêşangehê de nîşanê wan dabû. Bi rastî Melenî Carya keça Bernard Lewîsî, ku yek ji pisporên Zanîngeha Pensîlwanyayê bû, bûbû evîndar û bengiyê Deriyê Mizgefta Mezin a Cizîra Botan. Bêguman ji bo pêşangeha Deriyê Mizgefta Mezin a Cizîrê pêwîstî bi gelek pareyan hebû. Vêca bavê Meleniyê Bernard Lewîsî jî ji bo ku dilê keça xwe şad û bextewar bike û dilê wê neşikê ev 10.000 dolar bexşandine.

xwebûn

27 Çile - 3 Sibat 2025/ e-mail: rojnameyaxwebun@gmail.com / Hejmar: 267

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Abdullah Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw
Adar Gulan
Heval Dilbihar
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
Munewer Azîzoglu Bazan

**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mah. Kurt İsmail Paşa 2 Sk. Güneş Plaza No 18/22 **Yenişehir-Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

Ji bo abonetiyê
**Tel:** 0 (541) 806 84 85

# Koşk û qonaxên Rihayê

Fariz Firaz

Bajarê Rihayê demsala havînan zêde germ e. Zivistanan jî sir û serma ye. Mirovên bi hezaran sal berê li Rihayê bi cih û war bûne ji wê demê ve ketine nava hewldana parastina germ û sermayê. Mirovên wê demê ji bo karibin havînan xwe ji tîn û tîrêjên rojê; zivistanan jî ji sir û sermayê/seqemê biparêzin ketine nava lêgerînên dijwar. Erd qelaştin, di sînga ber û latan de menzel/goze ava kirin. Ji lat/kevirên şehkirî koşk û qonax ava kirin. Gelo ma ne ji ber van şert û mercên giran/zahmet bûna dê mirovan karîbûna bi kevir û latên heybet koşkên awarte ava kiribûna.

Dê karibûna koşk û qesrên bilind ava kiribûna? Ev koşk û qonaxên li Rihayê hatine avakirin, nexşeya dilê civakê û neynika bawariyan in. Hêz, afirînerî û giredana xwezayê ye. Koşkên Rihayê xwedî dîrokek kevnare ne. Rihê bi çand û dîroka xwe her tim mohra xwe li şaristaniyê xistiye. Ev yek bi mîmarî, avahî û warên dîrokî her tim awirên çavan dikşînin ser bejna xwe. Bi motîf û sazkirina avahiyan kevneşopiya civakê di dilê xwe de vedihewîne.

Koşk û malên ku li gorî zirûf û mercên avhewayê hatine avakirin di heman demê de bi fesil û nexşên li ser dîwarê wan hatine xêzkirin/hûnandin jî kevneşopî, çand û dîroka Rihayê vedibêje. Bîr û baweriya welatiyên Rihayê şopê şaristaniya Rihayê dide dest. Dîsa şekl û teşeyên mîmariya qonaxên Rihayê asta civakîbûn, xizanî, dewlemendî û pêşketina civakê diyar dike. Mîmarî û sazkirina van koşk û qonaxan neynika bawerî, civakî, aborî, çand û têkiliya mirovan a bi xwezayê re ye. Hemû rengên civakê yên hezar salan mirov dikare di nava rêzên dîwar, stûn, serder û şibakeyan de bibîne. Mirov ji şekl û şemalê van koşk û konaxan dizane ku ev war xwediyê erdnîgarî û avhewayek çawa ye.

Mirov dikare rengê şaristanê li ser dîwar û kevirên van koşk û qonaxan bimîne. Çawa malên Amedê ji kevirên reş ên bazalt, malên Deriya Reş ji text û daran, malên Heranê ji ax û kerpîçan hatibe avakirin, koşk û qonaxên Rihayê jî, ji kevirên spî û kilsînî hatine avakirin.

Koşk û qonax wekî mal û avahiyên Rihayê yên din ji kevirên kilsînî û spî hatine avakirin. Ji ber ku ev kevir kolandina wan û şehkirina wan hêsan e di hemû koşk, dêr, mizgeft û malan de hatine bikaranîn. Kevîrên kilsînî zivistanan germ havînan jî hênik in.

Riha ji ber ku hevînan pir germ e û zivistanan jî pir sar e, koşk û avahiyên wê jî li gorî şert û mercên avhewayê hatine avakirin. Ji ber ku mirovan wê demê zêdetir debara xwe bi çandinî û rênçberiyê dikirin, bêhna rez û bez ketiye dîwarên koşk û malan. Ji ber ku zêdetir bi çanda zevî û rençberiyê eleqeder dibûn kevneşopî li ser ruyên dîwar û mîmariyê xwe dide der. Ev çand û jiyana civakê reng û ruhê xwe di war, koşk û qonaxan de jî xuya kiriye. Dîwarên koşkên Rihayê pir stûr in. Hewşên wê fireh û eywanên wê dirêj û kûr in.

Gelek menzelên fireh û dirêj, kîler, sarinc û bîrên avê, depoyên erzaq û hawizên avê hatine avakirin. Tenûr mutbex cuda hatine avakirin. Dîsa ji ber sewalkariyê di beşên hewşên koşkan de menzelên sewalan jî cuda hatine avakirin. Odeyên demsala zivistanî cuda, odeyên demsala havînan ji hev cuda hatine avakirin.

Hin koşk 2 qat, hin koşk jî sê qat in. Hewşên koşkan bi hawiz, dar û beran ji germahiya havînê dê parastin. Di beşên hewşê yên cuda de, di hundirê curnên mezin ên ji kevirên spî hatine kolandin de darên cuda hatine çandin. Hewşê wan fireh û di orta hewşê de hawizên ji kevirên merher hatine sazkirin. Zêdetir di hundirê curnên dora hawiz de darên tû, hejîr, hinar û tirî, tahlî û cureyên darên dih hatine çandin. Li derdorê hin hawizan jî gul û kulîlk hatine çandin. Li curnên di hewşê de xwarina zêde lê tê rokirin. Ev xwarin ji aliyê civîk, mirîşk û sewalên bajêr ve tê xwarin. Di gelek koşk û qonaxan de serşok li aliyê malê hatiye avakirin û bi taybet hatine lêkirin.

Hewşên koşkan ên bilind û fireh ji 2 beşan hatine avakirin. Eywan û şanişîn jî li gorî demsalê hatine avakirin. Eywanên ji bo demsala zivistanê berê wan li başûr, ewyanên ji bo demsala havînê hatine avakirin jî berê wan li bakur dinere. Hewşa koşkê di nava herdu eywanan de dimîne. Di piraniya koşkan de hawizê avê heye. Deriyê eywanên koşkê yên başûr û bakur li hev dinerin. Ser koşkan bi metal û axê hatiye pêçan.

Koşk û malên Rihayê gelek jê ji hev cûda ne. Hin koşk û mal ji ewyanekê, hin koşk û mal ji 2 eynanan û hin koşk û mal jî, ji 3 û 4 eywanan pêk tên. Hêjmar û mezinbûna eywanên koşk û malên Rihayê li gorî nifûsa zêde zêdebûna mêvanan û dewlemendiya malbatê tê guhertin. Ger ku koşk yên malmezinê êl û eşîrê be, koşk û xana wî li gorî wê tê guhertin. Ger ku malbatek mêvanperwer be û zêde mêvanê wan hebin jî mezinbûna koşk û konaxê li gorî wê tê guhertin. Lê di demê dawî de koşk wekî otelan tên bikar anîn.

***Mîmarî***

Deriyekê koşkê vedibe hewşê Deriyek jî vedibe kolanê. Dema mirov di deriyê kolanê re darbasi koşkê dibe salonek fireh derdikeve pêşiya mirovan. Li orta salonê derenceyek fireh û pêlikên wê bi merş/berik ê mûyê bizinan hatiye raxistin derdikeve qatê 2emîn. Li pişt dawiya salonê pişt derencê deriyekî fireh derdikeve hewşa koşkê.

Hundirê eywanê bi amûr û xemlên cuda hatine neqişandin. Li çep û rastê salonê du odeyên fireh û dirêj deriyên wan vedibin heywanê menzelê, bi xalîse û esîdeyan hatine raxistin. Li dora dîwarên menzelê balgiyên hundirê wan tijî qamiş li ser mînderk û doşekan hatine rêzkirin. Seranserî dîwarên menzelan bi doşek û balgiyan hatine rêzkirin. Li van odeyan xwarin tê xwarin.

Ev salon hin jê çarqozî û jora wan dişibe qubeyan. Hin jî zirav û dirêj û dişibin tunelan. Li nava menzelan maseyên nizm biqasi bihostekê ji bo xwarinê hatine rêzkirin. Li hin koşeyên odeyê li ser sehpayên biçûk sinî û li ser siniyê jî surehî ango kûpê avê yên sifir ango tûtyayê tên xemilandin. Di dîwarên odeyan de şibayekên biçûk hatine vekirin. Jora odeyan dişibin qubeyan û bi kemeran hatine hunandin.

Piştî mirov eywanê derbas dike hewşek mezin derdikeve pêşberî mirovan li çep û raste hewşê bi ser heman salonê ve avahiyên duqat hewşê dorpêç dike. Li milekî derî li teniştа diwarê eywanê sarinç hatiye kolandin.

Derdora deriyê sarincê bi kevirên xemilandi bi qazî 2 buhostan ji erdê hatiye bilind kirin. Jora sarincê di hundirê dîwar de wekî mînberek cih di dîwar de hatiye çêkirin û dewla avê lê hatiye daliqandin. Beşên çep û rastê hewşê bi mîmariyek hevcot hatine avakirin û li ruyê/wecê hev dinerin.

Piraniya wan qatê ewil nêvî di bin erê de ye. Bi nîv derenceyê mirov derdikeve qatê duyem. Qatê sêyem jî bi derencên mezintir û bilindir mirov derdikeve jor. Di nava hewşê de hawizên mermer û xemilandî hatine avakirin. Li derdorên van hawizan gul û kulîlk hatine çandin. Hin jê jî darên cur be cur hatine çandin.

Hin koşk wekî otel û aşxaneyan tên bikaranîn. Li van koşkan hewşên wan jî mase lê hatine bicihkirin û mêvanên tên van koşkan ên dixwazin dikarin li hundir ên dixazin jî dikarin li hewşê li ser maseyan xwarinê bixwin.

Çarçoveyên derî û şibakeyên van koşkan bi taybetî hatine neqişandin. Hin derî û şibake çarqozî û qirover, hin şibake û derî jî jora wan dişibe kemerê. Camên wan bi rengên cuda hatine heqişandin. Di gelek menzel û eywanan de ji bo hewayê bistîne taq/şibake yên biçûk ku dibişin stêrkan vedibin derve.

Qatê jerin ku wekî bodrûmê ye zêdetir cihê kîller û nanpêjiyê ye. Li vir xwarin tê çêkirin û firaq tê şuştin.

Zêtetir xizmeta mêvan li qate jêrin tê kirin. Li qatê navîn jî zêtedir cihê rûniştin û xwarinê ye. Tebeqeya jor jî zêdetir cihê westan û razanê ye. Ji ber ev qat bilind derdora bajar li vir xweştir tê xuyakirin. Her wiha derî û şibakeyên vî qatî zêtetir in. şibakeyên vî qatî bi mîmariyek taybet û awarte hatiye neqişandin.

Hin koşk jî ji 2 qatan pêk tê. Li van koşkan şikabeyên qatêr jêrin hêj zêdetir in. Dîsa fîgur û motîvên liser dîwarên van koşkan hêj bi serêşiyek mezin hatine xemilandin. Ev koşk wekî bi qelemê hatibin neqişkirin. Kevirên wan bi taybetî hatine teşekirin û şehkirin. Serdera eyşanan û hunduriê ewyanan bi mimariyek taybet hatiye çêkirin.

Ji ber li Rihayê kevok perçeyekî çandê ye, li hin koşk û qonaxan bi taybetî kevok tên xwedîkirin. Her wiha li her qatî di curnan de gul û kulilk rengekî zindî didin kevirên koşkan. Ji ber ku jora banî ax e li her koşk û konaxê bangirtan ango gindor heye.

Taybetiyek Riha û çanda Rihayê jî şevbihêrkê wê ne. Şevbihêrk bi taybetî li van koşk û qonaxan tên li darxistin. Dengbêjên Rihayê ji bo dil û kêfa mêvanan xweş bikin li salon û eywanên fireh ên van koşkan her şev şevbiherkan lidar dixin û dilê mêvanan xweş dikin. Dema şevbihêrkan li dar dixin mêvan jî li gorî dilê xwe govend digrin û direqisin. Li keyfa xwe dinerin. Dîsa di dema xwarinan de stranbêj şahiya muzîkê didin. Ji ber çanda şevbihêrk û dengbêjiyê hertim ev koşk û qonax deriyê wan mêvanan re nayê girtin û 24 saetan zindî ne.

**Hin koşkên navdar**

Konaxa Mahmud Nedîm, Koşka Sakip, Koşka Cewahîr, Koşka Gulîzar, Koşka Çardaxî, Mala Rûsipiyan, Mala Hacî Hafiz Ahmet. Mala Şahap Bakir, Konaxa Hecî Mistefa û gelek koşk û malên din hene.



Mirovên bi hezaran sal berê ketin nava lêgerîna parastinê, ji keviran xanî ava kirin. Kevir bi teşe kirin û ruh dan keviran. Ji bo xwe kirin wargeh û stargeh. Ji van keviran qesr û qonax ava kirine. Qesr û qonaxên li Rihayê wêneyê çanda mirovahiyê nîşan dide



